



Article

International Journal of Kurdish Studies

(ISSN:2149-2751)

4 (1), pp. 155 – 175

<http://www.ijoks.com>

Di Nav Kurdên Diasporayê De Kêşeya Navnewşî: Mînaka Elmanyayê

Avdo KARATAŞ¹

Received: Feb 01, 2017 Reviewed: Sep 28, 2017 Accepted: Oct 06, 2017

*The generation conflict between the Kurds in diaspora***Abstract**

The largest center of the Kurdish Diaspora in Europe is Germany. Kurds have migrated to Germany at different times but massively before Turks. Although the Kurdish population is not accepted by the official authorities, it is the third largest minority in Germany. Here they organized, educated, began some business and by the way third generation is raising their kids. Nevertheless the Kurds are not considered as an independent minority in scientific research and are not researched as such. So the scientific data on the Kurds are very few.

Both some researches and media and our research shows that : Boys and girls leave the house in a significant number of Kurdish families. Some of them committed suicide, some of them were killed and some of them were kicked out of their homes by their parents. And also some were forced to marry. This means that there is a problem between the children and the parents (conflict of parental and filial) in the Kurdish family. Kurdish youth from the other side are very active in the political arena. But what is remarkable here is that the social conflict of generation does not exactly appear in the Kurdish society. The purpose of this article is to examine following situation in general: Could the problems between the Kurdish generations be defined as the conflict of generation? And If there is a conflict of generation, why does not it appear in the Kurdish society in Germany.

Keywords: The Kurdish diaspora in Germany, conflict of generation, Kurdish social organisation

Puxte

Cihê diasporaya Kurd ya li Ewropa ya herî mezin li Elmanya ye. Kurdan di demên cuda de lê bi girseyî bêyî Tirkan koça Elmanya kirine û hejmara Kurdan çiqasî bi aliyekî resmî nehatibe pêjirandin jî, li Elmanya kêmeteweyê seyemîn in. Li vir organize bûne, xwendine, dezgehên karsazî vekirine û di vê demê de newşên seyemîn zarokên xwe mezin dikin. Lê belê Kurd di mijara lêkolînên zanistî de wek kêmeteweyeke bi serê xwe nayan dîtin û ji vî alî ve nayan vekolan. Ji bona vê yekê doneyên zanyarî di mijara Kurdan de kêmet in.

Li Elmanya li ser civaka Kurd di salên 1998an û 2000an de ji aliyê Susanne Schmidt ve du lêkolîn hatin weşandin. Di van lêkolînan de cara yekemîn çarçoveyeke civata Kurd lê bi gelemperî ya ciwanên Kurd li Elmanya hate danîn. Li cem gelek encamên balkeş, yek jê jî ev bû ku di nav civaka Kurd de ji aliyekî ve kêşeyek mezin di navbera nişan de ru daye, lê ji aliyên din ve ev kêşe xuya nedikir. Ev mijar xaleke pir balkeş ya lêkolînê bû. Di lêkolîna ji aliyê me ve hatî kirin de jî dihat xwiyakirin ku ji aliyekî ve di hejmarek mezin malên Kurdan de keç û kur ji malê direvin, hinek xwe dikujin/hinek dihatin kuştin, hinek ji aliyên dêûbavên xwe ve ji malê hatine avetin. Hinek bi darê zorê dihatin zewicandin û hwd. Ev tê vê wateyê, ku kêşeyek di nav malbata Kurd de yanî di nav zarok û dêûbavan (Kêşeya Parental û Filial) de heye. Ji aliyên din ve ciwanên Kurd di warê siyasî de pir çalak in. Lê belê balkeşiyek di vir de heye ku bi tevahî mirhov kêşeya navnewşî ya civakî di nav civata Kurd de nabîne. Armanca vê nivîsê bi gelemperî vekolîna vê rewşê ye: Gelo mirhov kare pirsgirekên navbera newşên Kurd de wek kêşeya navnewşî binav bike û wekî kêşeya navnewşî hebê, çima di civata Kurd li Elmanya de ru nade der?

Peyvên Serekê: Diaspora Kurd li Elmanya, kêşeya navnewşî, organizasyona civakî ya Kurdan

¹ Doktorant li Zangoya Albert-Ludwig li bajarê Freiburg yê Elmanya, Mamosteyê Kurdî û Pedagog e. E-Mail: avdokaratas2@gmail.com

Recommended citation:

Karataş, A. (2018). Di Nav Kurdên Diasporayê De Kêşeya Navnewşî: Mînaka Elmanyayê. *International Journal of Kurdish Studies* 4 (1), 155 – 175, DOI:

Destpêk

Mirhovnasa Emerîkî Margaret Mead (1971: 111) ji bona têkiliya di navbera newşan de di dema nujen de dibêje ku „*Ne me piştra (nesil), ne jî zarokên me pêşra (bavûkal) hene*“. Bi vê gotinê Mead têne zimên ku cudatiya di navbera newşên ciwan û yên kal pir gir bûye û qutbûnek di nav herdu newşan de çebûye. Ev gotin mijara newşan di civakên modern de ku mijareke sereke ye, bi ramanêke kur têne zimên.

Wekî gelek fenomenên civakî, çandî, dîrokî, mijara newşan jî di nav civaka Kurd de nehatiye lêkolîn- û şîrovekirin. Mijara kêşeya navnewşî û guhertinên civakî bi hev re girêdayî ne. Civakên Kurd di warê tewgera siyasî de ji sed salan berê û sed salan piştî Şerê Cîhanê Yê Yekemîn ve, carna rawestandînen demkî hebin jî, pir aktîf in (bnr. Özdemir 2006; Yildiz 2005; Beşikçi 1994; Ekinci 2009; Tan 2014; Heinrich 1989; Franz 1968; Heinrich 1989; White 2012). Gelê Kurd di her aliyê Kurdistanê de nemaze ji salên 60î yên sedsala 20an ve di bin bandora guhertinên civakî, siyasî, çandî û aborî de ne. Di vî demî de aboriyeke modern cihê hinberandina cotyarî girtiye. Kedkariya cotyarî lawaz bûye. Her çikasî aboriyeke kapîtalîst ya diravî li her derê Kurdistanê belav nebûbe û di bazara cîhanê de cih negirtibe jî, di demên dawî de hem burjuvaziyek hem jî çineyeke karkeran bi ramana nasnama Kurdî bi alîkariya neftê xwe dide xwiyakirin (bnr. White 2012). Rêjeya mirhovên li bajaran dirûnin ji yên li gundan di runin zêdetir dibe û bajartî geş dibe. Di nav civakê de çîn jî hev cuda bûne. Tevgerêke siyasî û nasnameyeke netewe karaktereke kollektîf sitandina û gihana heta çîna bin ya civakê. Di vir de hêjayê gotine ye ku ev guhertinên di civaka Kurd de li gorî guhertinên civakên modern pir kêr û lawaz in, lê li gorî jiyana Kurdan ya di sedsala 19an de pêşketiyek mezin e. Lê mixabin, anko lêkolîn nehatine kirin, mirhov nikare agahiyên zanistî li ser wan mijaran li ser Kurdan bistêne. Ji bona vê yekê mirhov nikare mijara kêşeya navnewşî bi guhertina civakî re di nav Kurdan de bixwene. Lê belê dîse jî hinek xal hene û didin xwiyakirin ku guhertinên mezin di nav civakên Kurd de ru didin.

Heta nivê sedsala 19an de pergala mîrîtiyê piştî serhildanên wan bi hewldana Dewleta Osmanî ji bona navendkirina pergala dewlete ji erdê hatin rakirin (bnr. Akpınar & Bozkurt 2011; Behrendt 1993; van Bruinessen 2003; Strohmeier & Yalçın-Heckmann 2003; Jwaideh 2012; Izady 2011). Aktorên van serhildanan tenê mîr bûn û bi serhildana Şex Ubeydullah di sala 1880î de êdî kesayetên oldar yên wek Şex, Melle û Seyidan rêveberiya serhildanên Kurdan kirin. Ji 1940an heta îro partiyên modern yên xweyî îdeolojî ve tevgerê dişopînin (bnr. van Bruinessen 2003; Heinrich 1989; Franz 1968).

Koçberiya Kurd jî piştî her mudaxaleya li ser civaka Kurd herdemî ru daye. Îro di vî warî de diasporayek mezin ya Kurdan ava bûye. Ev civata koçber bi toreke xurt bi welatên xwe ve û bi cîhanê ve girêdayî ye, saziyên xwe ava kirine û di aliyê siyasî de pir aktîf in.

Bi ramana teorîk ne pêkan e ku civaka Kurd ya diaspora ji bûyerên li welatên wan çedibin, bêpar bimêne. Diaspora Kurd jî bandoreke mezin ji dîroka xwe ya siyasî sitandiye. Lêkolîna Brieden (1996) vê bandorê bi aliyeke eşkere derdixê holê. Di vê lêkolînê de tê xwiyakirin ku bandora tevgera siyasî di ware nasnamê de civak bi tevahî guhertiye. Li gora lêkolîna Brieden (1996: 40b), di sala 1985an de ji sedî 40 goçberên Kurd li Elmanya xwe wek „Tirk“ dane naskirin. Lê belê di sala 1994an hejmarê ku xwe wek „Tirk“ dayîn naskirin ji sedî 0 bû. Lê belê, wek li jêr de were vegotin, li cem vê guhertina mezin ya siyasî û nasnemeyî, heman guhertin di warê civakî de ru nedan.

Li gorî zanistiyê wekî di nav pergaleke civakî de tevgera siyasî, civakî, aborî an çandî hebe, li vir mijara newşan heye (Kehrer 1959; Fogt 1982; Stiksrud 1984; Leonard 1984; Engels 1984). Her çikasî di vir de derfetên dahûrana (analîz) civaka Kurd nebe jî, pêwîst e, bi mijara kêşeya navnewşî di diaspora Kurd de were dahûrankirin. Bingeha vê gotarê pîrsa kêşeya navnewşî ya Kurdan e û pîrsa sereke jî “gelo kêşeya navnewşî di nav civata kurdên diasporayê yê li Elmanya de çawa xuya dike?” ye.

Wekî mirhov di dîrokê de li kêşeya navnivşan dinere, xwiya dike ku ev mijareke kevin e, lê belê wateyeke newşî ya demên nûjen di nav kêşeyên kevin de tune ye û bi gelemperî mijar, kêşeya nav *zar û bav* de ye (bnr. (Nagengast & Schuh 2008; Stiksrud 1984)². Kêşeya navnewşî ya bi wateya îro ji sedsala 19an ve heye (Kehrer 1959: 4) û ji we demê ve karaktereke pergali sitandiye (Fogt 1982: 6). Ji dema ciwanan di nav civakên pêşketî de ramanê rexneyî avakirin ve, di nav wan civakan de kêşeya navnewşî heye. Her çiqas li ser newe rawestî jî, têkiliyek kêşeya navnewşî û têgihiştina pîrsgirêkên civakî, çandî, aborî û takekesî bi hev re heye. Yanî têkiliyek di navbera kêşeya navnewşî û rexneavakirina newşên nu heye. Gelek zanyar (wek Mead 1971) têkiliyê di navbera şoreş, modernîte û newş de wek mijarek xwe-bi-xwe dibînin, lê hinek zanyar vê red dikin û dibêjin ku têkiliyeke bêgavî di navbera wan fenomenan de tune ye (wek mînak Jureit 2008: 32). Mijara newşan ne tenê bi îdeolojî, raman û çandê ve girêdayî ye, lê belê hevrawestên dijî pîrsgirêkên civakî jî di vê mijarê de roleke girîng dilîzin. Bi gelemperî heman newş di cihê pîrsgirêkê de xweyî hevrawestekî (durus) ne. Mijara kêşeya navnewşî di konteksta Kurd de di vir de derdikevê holê. Heke newşên Kurd raman û hevrawestek rexneyî dijî rewşa civaka Kurd ya de facto îro heyî de avakiribin, tê wê wateyê, ku di nav civakê de guhertinên xurt derketine. Dahûrana vê têkiliyê mijara vê gotarê ye.

Wekî mirhov li rewşa avakirina newş di civaka Kurd de dinere, di serî de bala xwe dide zimanê Kurd, gelo ev rewş di nav zimên de cihê xwe girtiye an no? Bi cavdêriyeke kurt li zimanê Kurdî dinere, dibîne ku pênasiyeke fenomena kêşeya navnewşî ne di zimanê devkî, ne jî di zimanê nivîskî de wek bi îngilîzî *intergenerational conflict* (generation konflikt), bi fransî *conflit des générations*, bi Elmanî *Generationenkonflikt* bi Tirkî *kuşak çatışması* di zimanê Kurdî de ne runiştîye. Ev jî tê wê wateyê ku gelê Kurd pevistiya peyvek wusa nedîtiye. Ne diyar e gelo ji bona vê fenomenê çî werê bikaranîn. Ji bona conflict/Konflikt peyvên *pîrsgirêk*, *arîşe*, *nakok*, *kêşe* ji bona Generation/kuşak *jî newş*, *nevş*, *nifş*, *qirn* û hwd. hene, lê belê têgina Generationenkonflikt tune ye. Wekî mirhov di ferhengên de li vê têgîneyê digere an jî ji mirhovên Kurd pênasiya vê fenomenê di herem, zarava an devokan de digere, rastiye peyv û pêşniyazên cuda cuda tê.³ Heman rewş di ferhengên Kurdî de jî xwiya dike.⁴ Ev rewş zimên dide xwiyakirin ku têgîneyek ji bona kêşeya navnewşî di zimanê Kurdî de cih negirtiye. Lê belê di zimanê Kurdî Peyva newş bi serê xwe xweyî du wateyan e: Yek jê ya komî ye û wek ‘mirhovên heman temenî’ yê di civakê de tê pênaskirin. Ya didoyan ya yekkesî ye û wek ‘mirhovê bi dema xwe ve’ pênas dike, wek gotina „newşê dema xwe ye“. Di vê gotarê de ji bona têgina kuşak çatışması/Generationenkonflikt kêşeya navnewşî hatiye pejirandin.

² Wusa xwiya dike ku di vê mijarê de bi gelemperî kêşe di nav bav û kur de tê dîtin û mijara dê û keç pir naye xwiyakirin. Wusa xwiya dike ku di vê mijarê de bi gelemperî kêşe di nav bav û kur de tê dîtin û mijara dê û keç pir naye xwiyakirin.

³ Li ser medaya civakî pîrsa pênasiya „kuşak çatışması“ hate kirin û nezikî 30 mirhovên Kurd bi zaraveyên cuda pênasiyên ji hev cuda pêşniyaz kirin.

⁴ Di Fernga Torî (1999) de *newş* heye, lê kêşeya navnewşî tune ye. Di Ferhenga Evidîlê Dirêj (2011: 244) de *newş* wek *nivş* hatiye nivîsandin û kêşeya navnewşî tune ye. Di Ferhenga Instîtuya Kurdî ya Stenbol de (1992: 774) *newş* wek *newş*, *nesl*, *babik*, *wert* tê nivîsandin. Di Ferhenga Abdulkadir Ulumaskan (2010: 239) de navê *newş*, *cîl*, *nesl*, *qirn* hene, lê têgîh tune ye. Ferhenga Berîka Ya Weşanxaneya Doz (2006: 302) de navên wek *newş*, *binaçe* hene, lê têgîh tune ye.

Di heman warî de mijara klasîfizekirina newşan (age grading) jî di nav civaka Kurd de gelekî ne diyar e û ne runiştî ye. Ev mijar ya sazîkirina fenomenên civakî ye û hê di nav civaka Kurdî de ne runiştî ye. Li diaspora kategoriya herî baş ya newşên kevin û yê nû ye. Wekî mirhov temenê ji cihê jidayikbûnê û hêvojkirina wan tevde bixê nav têtîniyê de, kategoriyeke dernakeve holê. Newşa kevin bi wateya „xweyî newşên nu“ hatiye pênaskirin. Ciwan zu dizevicin û zu dibin xweyî zarokan, yanî he ciwan dibin newşên dido. Wekî mirhov cihê jidayikbûnê dinere, dibîne ku carna her sê newş li welêt ji dayik bûne. Yanî mirhov nikare bêje, newşên li Elmanya ji dayik bûne, newşên duyemîn in. Ya din, koçberî berdewam e, yanî di nav Kurdan de koçberiya zincîrî heye û her demî koçberên nû dikevin nav civaka Kurd ya diasporayê de. Îro jî zarok an newş hene ku nû hatine. Bi gelemperî mirhov kare bêje ku du newş li welêt û du newş li Elmanya jidayikbûne.

Ev doneyên li vir hatine şîrovekirin, di dema teza min ya doktora⁵ de hatibûn berhevkin, lê bele wek mijarekî di tezê de nehatine bikar anîn û wek mijarek sereke di vê gotarê de hatine şîrovekirin. Mijar, bi tevahî li ser Kurdên li Elmanya ye. Done ji 123 pirsên hevpeyvînên tezê, yê di warê kêşeya navnewşî de hatine wergirtin, tên û ev bersiv li gorî medetolojiya kualitatîf ya Mayring (1990, 1990a) ya bi navê “şîrovekirina naverok ya kualitatîf” (qualitative Inhaltsanalyse) hatine şîrovekirin.

Di lîteratura ser kêşeya navnewşî de wusa xwiyadike ku her newşê gon dayî dîrokê, xweyî dîskurseke xwe ya taybet e, xweyî îdeolojiyê ye, têtîhiştineke taybet ya kêşeyên dema xwe û xwestineke wan heye. Newşên wusa yê civakî ne û wek ya 68î guhertinek afirandine. Di vê xebatê de newşên wusa wek *newşên lebatî* (aktiv) tên binavkirin. Ev newş rêveberiya pêşketinê civakî dikin. Li aliyê nujenkirê ne. Dijî binyad û nîrxên civaka runiştî derdikevin. Bi gelemperî muxalîf in. Ev pênasî dijberiya xwe jî bi xwe re tenê û newşê ku ji wan bingehên newşên lebatî bêpar in, wek *newşên tebatî* (pasiv) hatine pênaskirin. Ev newş bi gelemperî di rewşa konfirmîtet de ye. Raman, îdeolojî, diskurs, sembol û xwestineke wan ya taybet tune ye û ji pergala domînant razî ne. Dixwazin ku civak wek binyada runiştina xwe berdewam bike. Di munaqeseya li ser kêşeya navnewşî de pêwîst e, ev herdu parên newşê ji hev werin cudakirin, anko roleke wan ya aktîf an pasîf heye. Hejayê gotinê ye ku newş lebatî rêveberiya kêşeya navnewşî dike. Ji 1960an ve yekuneyek mezin ciwanên Kurd di nêwenga siyasî de pir lebat in. Lê belê ev naye wê wateyê ku ev newş di mijara civakî de, di nav civaka xwe de, ji bona civaka xwe û dijî civaka xwe di cihê newşê lebatî de ne.

Di vê gotarê de çar feraziye (hîpotez) hatine avakirin: 1) Her çiqas têra xwe doneyên cavdêriyê ji bona cureyek kêşeya navnewşî hebin jî, têtîhiştina „kêşeya navnewşî“ wek di konteksta cihana rojava de di nav Kurdan de hê derneketiye. 2) Kêşeyek mezin di navbera zar û dêûbav (kêşeya Parental û filîal) de heye, lê ji bona sîtratejiyên malbatî, ev kêşe di nav civakê de ru nade. 3) Newşa dixwaze, xwe ji ramana raser ya civakê dur bixe û newşa dixwaze wê bi xwe ve girê bide, kêşeya navnewşî ya di nav civak(ên) Kurd de pênas dike. 4) Kêşeya navnewşî ya di nav civaka Kurd de û ya di nav civaka dewletên koçergirt (göçmen alan ülke) de ji hev cuda ne.

2. Di konteksta Zanistiyê De Mijara Kêşeya Navnewşî

Wekî mirhov li lîteratura li ser mijara kêşeya navnewşî dinere, du rêyen cuda derdikevin holê: yek jê, wek statîk-posîtîvîst e û bi gelemperî wek ekola Fransî tê dîtin. Ya din jî ya kualitatîf-dîrokî, ya Elmanî ye (bnr. Jureit 2008: 37). Ji bona mijara posîtîvîst di ekola Fransîyan de bêhtir têtîgeha (konsept) pêşveçunê (ilerlemecilik) heye. Di Teoriya posîtîvîst de genealojî rolekî girîng dilîze. Ev teorî wek nomotetîk tê dîtin, yanî li gora wan zanyaran „qanûnên dîrokî“ hene û zanyar karin wan qanûnan derxin holê. Lê belê ev teorî cudatiya malbatî û civakî nake û ji aliyên gelek zanyaran ve tê rexnekirin. Teoriya din ya li ser newşan ya teoriya

çandî-civakî ye. Endamên ve teoriyê dijî ramana nomotetîkê derdikevin û dibêjin mirhov nikare qanunên civakî derxe holê.

Mijara kêşeya navnewşî heta dema postmodern bi gelemperî li ser bingeha rêveberiya civakê bi ramana pêşketinê û bi gelemperî ji aliyên newşên nu vê dihat guftûgokirin. Ev tê wê wateyê ku newşekî xwe ji nix û pergala siyasî ya domînant cuda dikir û dijî vê derdiket. Ev newş bi gelemperî wek newşek elît dihat dîtin û bi ramana avangartewger dikir, yanî ji aliyê komekî elît ve dihat rêvebirin. Lê belê balkeşiyên dema berê yê di destê elîtan de îro ketine destê herkesî de. Ji bona vê yekê îro mijara newş behtir giriftî bûye.

Wek tê zanîn, mijara kêşeya navnewşî mijareke modern e⁶. Ev kêşe cara yekemîn di nivê sedsala 19an de hate fehmkirin (Kehrer 1959: 4). Di vî demî de jihev cudabûna newşan eşkere bûye, yanî wek karakterekî sereke yê modernê derketiye holê. Belê kêşeya navnewşî çî ye? Her çiqas zanyar ji sedsala 19an heta îro bi zedebûn bala xwe berdabin ser kêşeya navnewşî jî, pênasiyek sitandart ji bona vê tune ye. Berî civakên cîhanê modern bibin, filsof û zanyaran newş li gora temenê wan pênas dikirin. Wek mînak, Agust Comte di sala 1839an de *newş* wek, „yên pîrên kevneşopî û yên ciwanên nujen“ ji hev cuda kiriye (Fogt 1982: 6). Vê cudatiyê heta niha di zimanê rojevê de cihê xwe girtiye. Bi gelemperî ciwan wek ‘nunerên nujentiyê’ û pîr wek ‘yên kevneşopiyê’ tên dîtin. Di sala 1843an de John Stuart Mill jî peyva newş di heman wateyê de bi kar aniyê. Lê belê îro mijara newşan ji van pênasiya giriftir e. Cara yekemîn ji aliyê John Bagehot ve di sala 1872an de peyva newşên polîtîk di warê guhertina elîtan de hatiye bikaranin (Fogt 1982: 6f). Ji civakên kevneşopî re pênasiyek wusa bes bû, lê belê bi pêşketina civakê re têgîna newşê bêhtir girift bû û karakterên cuda girtin ser xwe, ji ber ku mijara newşê mijareke moderniteyê ye. Nujenbûna civakî bi newşên nû (ciwan) ve hatiye giredan. Ji bona vê yekê bi gelemperî ji sedsala 19an ve newş û ciwan sînonum tên dîtin. Anko ciwan wek şikestina pevajo ya civakê (Manfred Riedel), ji bona pêşketin û guhertinê tên dîtin, di mijara vegotina guhertina civakê de her demî dibin mijareke sereke (bnr. Jureit 2008: 41). Lê belê pêwîst e ku têgînên newş û hev girtina newşan (Generativität) ji hev werin cudakirin. Yanî hejmara hemu mirhovên hevtemenî (hemdemî) di civakekî de bi serê xwe newşekî awa nakin.

Dilthey newş di sala 1975’ê de wusa pênas kiriye: „*newş, nişandaniyeke tevgerî ya hevdemî ya wan takekesan e; yê bi gelemperî li cem hev mezin dibin, yanî zaroktiyeke hevpar û temenekî ciwantî yê hevpar hebin ku tê de nêvenga dema bi heza zilamtî tene cem hev. Yê wusa em wek newş bi nav tînin.*“ (jêgirtin Fogt 1982: 8). Di vir de newşên hemen temenî, yê serdeçunên hevpar hebin û heman bandor ji pêkhatiyên bigrin ser xwe, dikevin nav pênasiya Dilthey de û newşekî ava dikin. Griese newşê wusa pênas dike; newşek ev kesên di heman temenî de ne, yê li derdora çandê de ji bona rewşeke dîrokî-civakî ya hevpar, motîfasyon û ramanekê nixî ya hevpar hene (ji Griese 1982: 81 jêgirtin Stiksruud 1984: 194). Ji bona hinekan newş mijarek koma qedêrî (kader birliği) ye (Stiksruud 1984: 193) ji bona hinakan ne tiştêk şênber an real e, mijarek konstrukt e (Nagengast & Schuh 2008: 13f). Yanî newş hem peyveke ku takekesiya bicihkirinê (sınıflandırma) ye hem jî di hevdemî de peyveke kollektîf ya xwe-bi-xwe-binavkirinê (kendi kendini tanımlama formu) ye (bnr. Jureit 2008: 33).

Piştî pirsgirêka pênasiya têgîna newşê, pirsgirêka din, pîrsa karakterên newşê ye, ku newşê ji hev girtina newşan (Generativität) cuda dike. Têgîna newş ji ya çînî, koma elîtan û hwd. cuda ye û potensiyeleke mezin ji bona avakirina nasnameyeke heye. Lê dîse jî newş kutleyeke anonîm lê kollektîf e, kesên xwe bi newşekî ve girêbidin, xweyî ramanekî hevpar in. Di vir de pêwîst e, were têgihiştin ku mijara newşan mijara tegihiştina kollektîf e û xwedî diskursek hevpar e. Ji bona vê yekê jî mirhov kare bêje ku „avakirina newşa“ (‘generation building’) pevajo yeke siyasî, çandî û civakî ye. Di bingeha peyva newş de têgihiştin (düşünce), hezkirin

⁶ Ji bona kêşeya navnewşî di dema antîk û serdemî navîn bnr. Brandt et.all. (2008).

(hissetmek) û tevgera (hareket) mirhovan heye. Ev jî bi bandora ji sosyalîzasyonê (Jureit 2008: 36) ve û ya akulturasyonê ya kollektîf ve giredayiye. Hellenbach sê cureyên nişandana newşan ji hev cuda dike; bedenî, dîrokî û cîhana jiyânî (yaşam biçimine dayanan) (Kehrer 1959: 7). Yanî newş pêwîst e, bi wan sê fenomenan werin guftûgo- û lêkolînkirin. Newş ji ber xwe (kendiliğinden) tune ne. Pêwîst e newş xwe-bi-xwe wek newşekî bibîne û xwe wusa bide *xwiyakirin*. Ji bona vê yeke diskurseke newşî ne pêkan e ku beyî *pevguhaziya civakî* (sosyal îletişim) cih bigire (Kraft & Weißhaupt 2009). Pêwîst e, newş xweyî hestekî civakî be û sembolên xwe ava kiribe ku bingeha diskursa xwe deyne. Heke komek mirhov heman serdeçuyî nebin û dijî heman serdeçuyî pozisyona xwe eşkere nekiribîn, têkiliyeke taybet di nava wan de çênabe. Di nav kêşeyên navnewşî de mijara konseptî pêşerojê heye. Ji bona vê yeke mijareke bi ciwanan ve giredayî ye⁷. Karaktereke newşî ev e ku „qutbûn“ekê ji malbatê û civakê derdixe.

Karaktereke din ya sereke ev e ku mirhov, newşan bi çî ve girebide jî, her demî mijara *pevnekirî* (bağdaşmama) ye. Newşên nû bi binyadên jiyânî, ehlaqî, nîrx, raman û dîtinên di civakê de runiştî, ne memnun in û wan bi gelemperî na pêjirenin (newşên nu) an jî ji bona pejiwandina wan hewl didin (newşên kevin). Ji bona vê xalê, li dera kêşa navnewşî hebe, çanda rexneyî jî heye. Nujenkirina civakî ya diyalektîk jî ji vir tê.

Karakterî din ya newşî tevger e. Wekî newşekî ramanek cuda li ser rewşa civakê an jî jiyânê avakir, ji bona wê ramanê diskursek konstruktîkir û argumentên xwe bi bingeh kir û li gora diskursa xwe sembolên xwe afirandin û ji bona wan berxwedaniyek da, hingî tevgerek di nav gotinê de ye. Armanca tevgereke civakî ev e, jiyancîhanek nû bikê cihê ya kevin de. Kêşeya newşî xwe her demî li ser “guhertin”ekê bi cih dike. Beyî guhertin, kêşe jî ru nade. Di nav civak an mirhovên ketin bin *metingeriyê* (sömürgecilik), civakên di nava wê de şoreşek pêkhatî an pergala siyasî bi bingehin ve hatî guhertin, mirhov an komên koçber û hwd. (bnr. Mead 1971) de hem mijara guhertin, hem jî ya kêşeya newşî diyar e û ev mijar bi babetên nasname, bişavtin û teşeya hilbirandinê ve giredayine.

Anko kêşeya navnewşî kêşeyek civakî ye, ev bi xwe re pîrsa kêşeya civakî tîne. Di nav gelên civakan de bi gelemperî kêşeya civakî (sosyal sorun) wek ‘arizeyên civakî’ tê tîgihiştin. Bi wan arizeyan pîrsgirêkên wek hêjarî, cudakerî, bindestî, alkool, tebatî, şidet, rajêriya bêhişker (tiryakî) û hwd. tînin zimên. Lê belê di nav zanistiyên civakî de kêşeya civakî wek “jirêderketina ji pergala civakî” (Devienz) tê tîgihiştin. Anko pergala civakan bi qanunan hatiye rêzekerin, hinek tevgerên dijî pergala civakî, wekî dijî qanunan yanî tawanbar, hinek jê wek dijî ehlaq, norm û nîrxên raser yên civakê tînin dîtin û wek “ne normal” tînin kodkirin. Mirhovên wusa wek yên nexweş an asosyal tînin demxekirin. Ji xebatên Karl Marx, Theodor W. Adorno û Max Horkheimer, Edward Said, Michel Foucault û hwd. bi vir ve ev baweriyên raser tînin guftûgokirin. Lê bele pîrsa, kêşeyên civakî ku bin nîzama civakî ve tînin giredan, çima derdikevin, nikare li vir were guftûgokirin.⁸ Di vir de kêşeya di nav malbatê de û kêşeya civakî ya di nav newşên cuda de çarçoveya kêşeya navnewşî dideynin.

3. Kêşeya Newşên Parental û Filial

Beşeke girîng ya kêşeya navnewşî, kêşeya di navbera zarok û dêûbavan (Parental- und Filialgenerationen) de ye. Anko kêşeya zarok û mezinan hem kêşeya genalojî hem jî ya civakî

⁷ Her çiqas zanyar li ser mijara hemantemenî rawestibin jî, ev xal, di mijara kêşeya navnewşî de xalêke pêwîst e û her demî bi binyadeke genealojîk ve giredayî ye (Kraft & Weißhaupt 2009: 7). Newşên ciwan û yên pîr rastiyekê jiyana xwezayî ne. Ji bona vê yekê bi gelemperî di civakê de sê newş tînin dîtin. Lê belê hemu civakên cîhanê ne sê newşî ne. Wek mînak; civaka Eskîmo civakek dunewşî ye. Wekî mirhovên kal bibînin ku ji yê ciwan re dibin bar, xwe dikujin (Mead 1971: 82). Li gora vê karakterî newşan civaka Kurd bi gelemperî sê newşî ye, lê belê peyvên *nevîçirk* û *nevîçirçirk* didin xwiya kirin ku civaka Kurd heman demî civakeke çarnewşî ye. Sedema sereke ya vê rewşê ev e ku Kurd bi gelemperî zu dizevicin û bi gelemperî sala yekemîn de xweyî zarok dibin.

⁸ Ji bona xebateke ku li ser vê pîrsê diraweste bnr. Mendel (1972).

ye, tşkiliya di navbera newş û malbatê di mijara kêşeya navnewşî de mijareke sereke ye⁹. Di vê mijarê de cih û rolê malbatê xwe bi wateyê mezin nîşan dide, ji ber ku malbat cihê ku pişt- û paşra derdixê holê û sosyalîzasyona zarokan bi cih tenê, cih û rolê . Heta li cihanê newşê xwe ji genealojiya malbatî cuda nekir (qutbûn) û xwe di konteksta hevtemenî de bicih nekir, yanî heta kêşeyek ramyarî û civakî derneket, kêşe bi gelemperî ya malbatî bû (Nagengast & Schuh 2008: 18) û kêşeya navnewşî ya bi wateya îro nebû.¹⁰

Berî dema modern de malbat, malbata mezin bû û peyvîrên wê curê cure bûn, yê wek mezkirin zarokan, parastin, hilbirandin û hwd. Ji bona vê yekê ji aliyê gelek zanyaran ve malbat ne têne wek malbat ku tede dêûbav û zarok dijîn, lê malbat wek malciwat (ev topluluğu) dihat dîtin (Nagengast & Schuh 2008: 14). Di wan binyadan de xeter ji aliyê malbatî ve dihatin bertarafkirin. Di dema modern de, bi gelemperî ji sedsala 19an ve, ev hate guhertin û êdî gelek peyvîrên malbatê ji aliyê dewletan û sazîyên wan ve tîn bicihanîn. Giredana takekesan bi malbat û civakê re karakterê xwe yê ku ji-ber-xwe heyî, wunda kir. Perwerdebûn di sazîyên modern de hat kirin û rola sosyalîzasyona malbatî lawaz bû. Takekesî cihê 'mirhov' girt û civak bi tevahî hate perwedekirin û disîplenekirin. Êdî ciwan ne bêgav in, li mezinan xweyî derkevin, anko pergala sîgortayê heye (Engels 1984: 37).

Ev mijar çarçoveya kêşeya navnewşî ya Kurd dideyne. Kêşeya zar û bav di nav malbata Kurd de kêşeyê mezin ya veşartî ye û motîvasyona vê kêşeyê ji guhertinên civakî tê.

4. Kêşeya Navnewşî Ya Civakî

Beşeya din ya bingehîn ya kêşeya navnewşî ya civakî ye. Kêşeya navnewşî bi gotineke gelemperî, hem sedem hem jî encameke guhertina civakî ye. Ji bona vê rastiyê tşkiliya di navbera newş û guhertina civakî de mijarek serekî, lê heman demî giriftî ye. Wek hatî gotin, di nav civakên kevneşopî de kêşeya newşan tune ye, anko guhertinên civakî hem kê, hem jî hedîka ne . Di van civakan de newş ji ber xwe hene, lê ramana newşî tune ye. Wekî kes xwe bi konteksta jiyana takekesî ji „giredan“ên civakî û malbatî „qut“ nekiribe, ne mijara „qutbûn“ ne jî mijara „giredan“ dikevê naveroka rojeva civakê de û hingî wê kêşe jî tune be.

Pirsa derketina civakên pêşketî pir hatiye guftûgokirin. Wekî mirhov wan guftûgoyan bi mijara guhertinê dide berhev, derdikevê ku pêşketina civakî bi ronensan, afirandina çapxanê û ronakbûnê (aydınlanma) re qeyd girtiye. Yanî ji hinga aqil di jiyana xwe de wek rêbazek raser danîn û xwe ji baveriyê (ol, baweriya geleri û hwd.) azad kirin ve, ramana aqlî rê dide civakan û civakên wusa bi vê bingehê pêşketin. Civakên pêşketî karin tenê bi guhertinê bijîn yanî guhertin karakterekî civakên modern e (bnr. Fogt 1982: 193). Di binyadkirin û şîrovekirina wan guhertinan de mijara newşan wek mijareke sereke ye (Jureit 2008: 36f). Ji bona vê yekê mijara lêkolînkirinê kêşeya navnewşî bi gelemperî di nav civakên pişesazî de tîn kirin (Fogt 1982: 193). Di civakên modern de her newş ji xwe re nixên cuda ava dike (Reifenrath 1984: 169) û xwe diafirene. Tşkiliya newşan û demê ji hev cuda ye û newşên nû xwe ji dinyaya ku ji aliyê malbat û civakê ve tê parastin, cuda kirine. Di wan civakan de newşên nû di demek din de dijîn. Wekî civaknasên bi nav û deng, yê wek Baumann, Chomsky, Beck û hwd. rast peyt kiribin, êdî civakeke dinyayê (dünya toplumu) heye û herî diçe ev civak mezin dibe. Yanî دنیا bi baskî yekbûne ve diçe û ev pîrseke girîng ya civakî, aborî, çandî û siyasî ye. Ji ber ku her civak nikare xwe bi vê pêvajoya cihanê ve entegre bike, ev jî tşkiliyê nû ya di navbera hêjar-dewlemend, pêşketî-paşdamayî de bi binyadeke bindestî (bağımlılık) ava dike. Modernîzmê ew qasî bandor li jiyane kiriye ku konseptên alternatîf yê civakî nikarin êdî derkevin. Weke Mendel (1972: 129) gotî, êdî bindestîya nû ne weke di dema kolonyalîzmê de bi nasname, ol û nixên 'zîlamê sipî' ve giredayîye, êdî bindestî bi teknîka wî ve girêdayîye. Teknîk bi vê rola xwe çand û kevneşopiyên berê dîkuje. Ji bona vê yekê newşên nû yê

⁹ Ji bona Parental- und Filialgenerationen bnr. Stiksrud (1984: 192).

¹⁰ Ji bona ramaneke dîrokî ya konseptê newşan di warê genealogî û civakî de bnr. Nagengast & Schuh (2008: 11).

civakên postmodern bînirx in. Newşên kevin teslîmî vê pêşketina teknîkê bûne û êdî bêhez in. Ev mijareke „valebûna civakî-çandî“ diafirene û ev mijar kêşeyeke taybet ya newşan derdixe holê. Alexander Mitscherlich di vê konteksê de mijara „civaka bêbav“ tênê zimên (bnr. Mendel 1972: 148). Aktorên vê pêvajoyê bêguman newşên ciwan in. Lê belê ciwan di çandên cuda de bi wateyên cuda tên pênaskirin û dîtin. Ciwan demeke jiyane ya di nav zaroktî û gihiştî de ye.¹¹ Di vir de dema ciwantî ne tênê bi aliyê biyolojîk ve tê formkirin, lê bi aliyê çandê ve jî tê giredan (Jureit 2008: 39). Ev mijar wê li jêr li ser civaka Kurd de were guftûgokirin. Tevgera ciwanan ji bona vê yekê tevgera nujenkirinê ye¹². Beyî avakirina çanda ciwanî, kêşeya navnewşî baş xwiya nake. Mirhov wusa bawer dike ku ji bona derketina çanda ciwanî pêwîst e ku civak dînamîk be û xwe zu biguherene. Yanî tekiliyek xurt di navbera civakên dînamîk, derketina çanda civakî, guhertin û cudatiya newşan bi hev re heye, anko kêşeya navnewşî bi civakî tê avakirin. Bi kîjan alî werê şirovekirin jî, rastiyekî nade guhertin ku şoreş, guhertin û şikestin fenomenên newşî ne (bnr. Jureit 2008: 31). Nivîsên tevgera demokrasî û azadiyê ya Fransiya, Îngîlîziya û Emerîkiya didin xwiyakirin ku di bingihê de mijara hezê şoreşî ya nukirina newşan heye û newşên nû aktorên vê pêvajoyê ne. Hem ji bona kêşeya nav malbatî de, hem jî ji bona kêşeya navnewşî ya civakî de mijara qutbûn mijarek sereke ye. Ev „qutbûn“ (bnr. Brocher 1973: 17) jidayikbûna kêşeya navnewşî ye. Anko di civakên pêşketî de qutbûn bi dawî hatiye, pirsgerêka sereke ya kêşeya navnewşî, wek Mead (1971: 9) peyt dike, mijara ‘giredan’ê (bağlamak) ye. Gelek caran hewldana newşên temenmezî ku dixwazin newşên nû bi xwe ve girêbidin, dibe arîşeyeke mezî. Di civakên pêşketî de êdî mirhov hewl nadin ku newşên nû bi xwe ve girêbidin, hewl didin wate û nirxa giredanê ji newşên nû re vegotin bikin, an jî „gîredan wek nirx“ pêşniyar dikin.

Bi gelemperî tê pejirandin ku piştî temenekî û bi ferbûnê mirhovên ciwan xwe ji *têgirtiyên serekî yên malbatî* (ailenin birincil bağları) dur dixin (bnr. Brocher 1973). Li gora Brocher (1973: 17) sê teşeyên qutbûnê, yên bi kêşeyek giran ve giredayine, hene: 1) qutbûna malbatî ya wek koma sereke (birincil grup olarak aile); 2) qutbûna ji komên kêmcihî (ikincil gruplar) yên wek dibistan an komên ciwanan û 3) qutbûna newşî yanî derketina ji sazîyên kevneşopî yên civakî, yanî qutbûna ji orf û adetan.

Li ser van pêşlêkolînên jor hatin danîn, rewşa kêşeya navnewşî ya Kurd wateyeke girîng distene. Wek li jêr were guftûgokirin; ji aliyekî ve ev mijar wek fenomeke veşartî xwiya dike, ji aliyekî din ve ne pêkan e ku di pêvajoya civaka Kurd ya îro de mijarek biyanî be. Ji bona vê rewşa girîftî divê mijarên bingeha kêşeya navnewşî di ware goçberî, malbatî û civakî de werê guftûgokirin ku rê ji bona dahûrana kêşeya navnewşî re vebibe. Bi rastî, anko di civaka Kurd de di mijara sazîkirina newşan de fenomenên ku karibin werin xwendin, kêmin, pîr zehmet e ku mirhov karibe newşan ji hev cuda bike. Lê belê pirsgerêka cudatiya newşan fenomenek unîversel e (bnr. Mead 1971). Ji bona vê yekê, çiqas newe xwiyakirin jî cudatiya newşên Kurd heye, lê anko qed nehatiye lêkolîn- û guftûgokirin, pîr naye xwiyakirin.

5. Koçberiya Kurd

Koçberî di bingeha xwe de dibe sedema kêşeyên cure. Kêşeya kognitif, kêşeya derdorê, kêşeya malbatê, kêşeya çand û jiyane, kêşeya hêjarî, kêşeya biyanî, kêşeya qutbûnê û hwd. di mijara koçberî de sereke ne. Lê belê mijara Kurd û koçberî dîrokeke hê nehatiye nivîsandî ye. Koçberî, hem di dîrok hem jî di rewşa rojana îro ya Kurdan de mijarek girîng e. Hem bi hejmarê xwe, hem bi sazî, medya, çapemenî û takekesên xwe yên perwerdebûyî û

¹¹ Di demên nû de di hinek civakên pîrpêşketî de wateya ciwan-pîr jî hatiye relatîvekirin. Li aliyekî ve temenê ciwantî bilind bûye, wek mînak; êdî li Emerikaya Bakur ji mirhovên nebera 60 û 80’yî de wek ‘*ciwanên pîr*’ û yên li ser 80’yî re ‘*pîrê pîr*’ tê gotin (Lehr 1984: 23). Lê belê di aliyên din de bi giredana hinek karan ve temenê ciwantiyê kurt bûye. Mirhovekî werzîşwan yê avjêniyê wekî bû 20, êdî wek pîr tê dîtin (vgl. Leonard 1984: 10). Mirhovekî model be, bi temenê 30’î êdî pîr tê dîtin.

¹² Di mijara navnewşî de têkiliyên di nav sosyâlîzasyon û netewe de mijarek sereke ye. Li cem gelên xweyî dewlet mirhov têkiliyên di nav wan herdu mijaran de, wek tiştêk xwezayî dibîne (bnr. Jureit 2008: 38).

rewşenbiriya xwe, diyaspora Kurd di warê Çareserkirina Kêşeya Kurd de dibe aliyekî sereke. Lê mixabin ev hêz li gora bergeha xwe neketiye rojevê de.

Hejmara Kurdan li tu deran bi îstatîstîkên bibawerî nehatine danîn, mirhov bi rastî nizane çend Kurd koçber in û çend li Elmanya bicih bûne. Yên qala hejmara Kurdan dikin, pêderxistinên xwe li gora texmînan derdixin. Ji bona texmînkirina hejmara Kurdan rêbazeke hesanî tê bikaranîn. Bi gelemperî zanyar li gora rêjeya Kurdan li dewletên jê hatine, hesab dikin. Wek mînak; li Elmanya rêjeya koçberên Kurd di nav koçberên ji Tirkîyê hatine, wek di navnera % 20 û 25 de tînan hesapkirin (van Bruinessen 1989: 28; Senol 1992: 63; Amman 2001: 121, Vanly 1988: 65). Li gora vê rêzê anko hejmara Kurdan li Tirkîyê navbera % 20 an 25an de tê hesapkirin, di navbera goçberên ji Tirkîyê hatin jî wusa hesap dikin. Yanî her ji çar koçberan yek jê Kurd tê hesapkirin.

Li gora Alinia (2007: 36) % 7-8 hejmara Kurdan di koçberiyê de jiyar dibe. Li gora Kızılhan nezikî 14 mîlyon Kurd ji derveyî welatên xwe dijîn (Kızılhan 2013: 38). Li gora hesabên Kızılhan, nezikî nîvê hejmara gelê Kurd dijî welatê xwe de dijîn. Yanî yekuneyeke pir mezin li derveyî welatê xwe de dijîn. Bi teybetî ji bona Elmanya jî ti hejmarên îstatîstîkî nebin jî, dewleta Elman hejmarek resmî pejirandiye. Parlamentera Elman ya Partiya Çep (Die Linke) ya bi navê Ulla Jelpke û hevalê wê ji parlamentoya federalî ya Elmanya pirsra „Çareserkirina Kêşeya Kurd û Rola Elmanya¹³“ kir. Parlamentoyê 24ê reşemî 2010ê de bersiv da. Di bersiva xwe de Elmanya cara yekemîn bi aliyek resmî qala hebûna Kurdan kir û da zanîn ku li Elmanya 800 000 Kurd dijîn. Lê bi rastî hejmara koçberên Kurd li Elmanya ji milyonekî bêhtir e.

Wekî Elmanya bi Tirkî re 10ê cotmehê 1961ê de Peymana Girtina Karkeran îmza kir, rê li koçberiya ji Tirkîyê ji bona Elmanya vekir (Abadan-Unat û yd. 1975, Abadan-Unat 2002; Ammann 2001). Ji wan koçberan re piştî „Koçberên Mehvan“ hate gotin. Lê belê koçberiya Kurdan ya Elmanya berî vê demê dest pê kiribû. Di demên berî Şerê Cihanê Yê Yekemîn de bi gelemperî zarokên malbatên reveberên civaka Kurd ji bona xwendin, kar an karmendiya Osmanî an ya Îranî dihatin Elmanya. Di salên 1940an de jî zarokên wan malbatan ji bona xwendine dihatin. Wan mirhovan sazî avakirin û hinek weşane derxistin. Bi wan xebatan di sala 1949an de li Parîsê „Navenda Lêkolînên Kurd“ û di sala 1956 de „Civaka Xwendewanên Kurd li Ewropa“ (Kurdish Students Society in Europe - KSSE) avakirin (Kızılhan 2013: 36). Hejmara mezin ya wan goçbera ji Rojhilat û Başur bûn. Ji dema 1980ê de koçberên bakur yê siyasî di nav Kurdên diyaspora de behtir bûn. Rengê koçberiya ji Tirkîyê bi rewşa polîtîk ve girêdayî bû. Wan Kurdên siyasî civata Kurd ya Elmanya bi tewahî polîtîze kir.

Îro li Elmanya civakeke mezin ya Kurd heye û hingî diçe mezin dibe. Ev civak xweyî saziyên xwe ye, di warê aborî de gihane qadeyekî bilind û newşê çar mezin dibe. Lê wekî mirhov baş li rewşa vê civatê dinerê, dibîne ku di aliyê civakî de pirsgerêkên giran hene. Anko ramana saziyên Kurd bi gelemperî li ser welêt e, yanî saziyên diyaspora ne û pir bi siyasetê ve girêdayîne. Ji bona vê yekê hewldaneke çareserkirina pirsgerêkên Kurdên koçber yê civakî, çandî an jiyancihanî pir lawaz e.

6. Malbata Kurd li Koçberiyê

Mal di nav Kurdan de wateyek xwe ya balkeş heye. Mal, hem tê wateya xanî, hem jî tê wateya malbat, hevser û dewlemendî (bnr. Strohmeier & Yalcin-Heckmann 2003: 199). Malbat nixweke pir bilind ya gelê Kurd e û sedema vê xurtbûna malbatê di dîrok û binyada organizasyona civakî ya kevneşopî de ye. Ji bona vê yekê malbat, weke ku vegotina gelek fenomenan, ji bona kêşeya navnewşî de jî roleke serekî dilîze. Hem kêşe hem jî stratejiyên çareserkirina kêşeyê di malbatê de tînan danîn û tînan praktîzekirin.

Binyada organizasyona kevneşopî ya civaka Kurd heta demên nezik de wek binyadên eşîrtî hatibûn avakirin. Di nava eşîretê de Yekmendiya-Silalê ji malê destpêdike. Yanî bingiha vê

¹³ Ulla Jelpke bi Christine Buchholz, Inge Höger û Fraksiyona DIE LINKE re ev pirs kiribû, bnr. Jelpke (2011).

binyada organîzasyona kevneşopî ji mala Kurd despêdikir û heta eşîretê berdeyamdikir. Malbat wek yekmendiyê xweserî dihat avakirin. Mal bi dem re mezin dibe û dibe bavik (bnr. Yildirim & Karatas 2014) û bavik heta silalê (Lineage) pêşve diçe. Her çiqas ev binyad êdî ne weke berê hebûna xwe berdeyam bike jî, cih, rol û wateya malbatê hê pir zîndî ye. Kontekstên civakî, siyasî û xizmîti (xweyîti) di qada malê de dest pê dikin. Ji bona vê yekê malbat desturmenda herî bihez ya civaka Kurd e (bnr. Altuntek 1993: 86). Heke weke kategoriyeke werê dîtin, malbata Kurd malbateke patriark û patrîlîniyar e (Barth 2001; Altuntek 1993; van Bruinessen 2003; Yalcin-Heckmann 2002). Yanî rola mêr di her hucreyê binyada malbatê de pir raser e. Esl (soy), navdanîn, rêz û rê ji aliyê mêr yanî zilaman ve dihat danîn. Di vê binyadê de statuya bira wekhev e (bnr. Barth 2001). Lê belê ev binyada kevneşopî ya malbatê di nav civaka Kurd de ne tenê ye û di nav hemû Kurdan de tune ye. Anko malbata Kurd, malbateke pirzarok e, bi xeletî wek malbata patriark tê hesibandin, lê ev ne rast e. Hejmara malbata patriark di nav civaka Kurd de pir kêr e. Mînak; Barth (2001: 30) di lêkolîna xwe de derdixe holê ku ji % 10 malbatên Kurd wusa ne. Teşeya malbata Kurd ya raser malbata dendik (Kernfamilie) e, lê belê anko ev malbata patriark binyadên xurt hene, ji malbatên din bêhtir derdikeve ber caxwan. Zewaca bi tiyê xwe re (Levirat), malbata sê newş, malên pirjinî (Poligyne), next (başlık), mafê zewacê bi dotmamê re (amca kızı ile evlenme hakkı) û hwd. di nav çerçova vê malbatê de ru didin (bnr. Strohmeier & Yalcin-Heckmann 2003: 203). Ev teşeya malbatî hem ji bingeha xwe hem jî ji binyada xwe ve, ya herî qadîm e û li dijî modernîzme herî kêr xwe guhertiye. Ev malbat bi gelemperî, wek li jêr were gotin, di konteksta postfiguratîf de ye. Xala bi kêşeya navnewşî jî di vir de ye. Di vê mijarê de rûdanên cihanê herî diçe malbatê biçuk dike, lê ev malbat xwe dipareze; her diçe rola jin û ya mêr di malbatê de wekhev dibe, lê di vê malbatê de zîlam hêjî hewl dide, cihê xwe yê raser bipareze; her diçe hêz di nava dêûbav û zarokan de biçuk dibe, lê di nav vê malbatê de ev hez he pir xurt xwiya dike. Di vê malbatê de cih, rol û peywîrên zarokan di malbatê de diyar e. Ev teşeya malbatê hewl dide zarokên mêr di nav xwe de bigre û dijî cudabûna wan e. Ji bona vê yekê di heman malbatê de mirhov kare sê/çar newşan bibîne û heta mirinê bav wek malxwê malê an wek serokê malbatê dimîne. Ji bona wan karakterên malbatê, vê cureya malbatî di dîroka Kurdan de herdemî rolek girîng girtiye ser xwe (bnr. Strohmeier & Yalcin-Heckmann 2003; Altuntek 1993; Leach 2001). Anko ev malbat pir girtî ye û ji guhertinê dur e, pirsgirêkên giran yê newşên ciwan di diyasporayê de behtir di vê malbatê de xwiya dike. Di vir de pirsêk muhîm derdide, gelo ev teşeya malbata Kurd di diyaspora de çilo xwiya dike, çilo tê guhertin an xwe çilo dipareze?

Koçberî bi qarkera xwe ya “guhertin” de şanoya kêşeya navnewşî ye. Anko di koçberî de mirhov bar dike, bi kêşeyên “kutbûnê” ve; anko di rojevê de pergalak biyanî raser e, bi kêşeyên “serêrastkirina rojevê” ve û anko koçberî cihbicihkirineke nû ye, bi kêşeyên “giredana nû” ve mijul e. Di wan her sê xalan de pirsgirêkên civakî, nasnameyî, aborî, zayendî, çandî bi rûdanên cuda cuda derdikevin û koçber bêgav e, wan pirsgirêkan bi sîstratejiyên xwe çareser bike. Di koçberiyê de tiştê ne xerîb/biyanî tenê malbat e. Di vê bingehê de malbat di koçberiyê de ji bona du xalan wateya xwe bêhtir xurt dike. Yek jê ev mijara li jor hatî zimên e; malbat di koçberiyê de fenomena tenê ya ne xerîb e û ya din ev e, anko malbat di koçberiyê de ji binyadên ku malbatê biparezin, yê wek binyadên kevneşopî, bêpar e, koçber di tîrsa xwe de ye ku zarokên wî wunda bibin, yanî zarok ji binyadên malbatî biyanî bibin an rolên dêûbav û zayendî ve xwe biguherenin. Ev jî dibe sedem ku malbat di diyasporayê de bêhtir hewl dide, xwe bipareze. Wekî mirhov dinere, dibîne ku kêşeyên bi keçan re bêhtir bi bandor in. Anko ev mijar kodên hemu nîrxên kevneşopî xira dikin. Anko kur her demî û li her derê bêhtir azad in an jî di nav her malê de kur bi heman cureyan derdikevin holê, gelekî ber caxwan nakevin an jî mirhov gelekî naxwaze wan bibîne, yanî wekî kur be, yê mezin caxwên xwe digrin. Lê belê wekî keç be, wek ne „normal“ tê dîtin û bandora wê jî bêhtir tê ber caxwan. Li diyasporayê dêûbav behtir ji zarokên xwe gilîdar in. Bi

gelemerî jî dêûbav her demî angaş dikin ku zarokên wan kasî ku ew ji wan hez dikin, ev jî dêûbavên xwe hez nakin¹⁴.

Gelo bi gelemerî di kîjan rewşan de kêşe derdikeve holê? Wekî tê xwiyakirin; yek jê wekî du rewşên çandî an civakî hev negrin, bi hev re di temasê de bin û hev bixwerênin, kêşeyek civakî ru dide. Mînak, wekî malbatên Misilman bêjin “em naxwazin zarokên xwe rêkin avjeniya hevzayendî” û dibistan bêje, “na! hûn mecbur in”, ev dibe sedema kêşeyeke civakî/çandî, lê belê wekî zarokeke keçik got; “ez dixwazim bi lawikan re herim avjeniyê” û dêûbav bêjin; “tu nikare here”, dibe sedema kêşeyek navnewşî. Ev kêşe nikare li welatên hinek koçberan ru bide, anko li walatên wan avjeniya keçûkurikan bi hev re tune ye û keç nikare bêje; “ezê bi dibistanê re herim avjeniyê”. Çima keç kare li diasporayê vê bêje? Keç kare bêje, anko di welatê koçberiyê de ev vebijerk heye û ji sedî 99 keçik bi kurikan re diçin avjeniyê¹⁵. Yani kêşeyên civakî karin kêşeyên navnewşî biafirenin. Ev dide xwiyakirin ku kêşeya malbatî hem di warê civakê de, hem jî di yê takekesî yanî newşî de derdikeve û pêwîst e, malbat wan herdu pirsgirêkan çareser bike. Hejayê gotinê ye ku mijara koçberî êdî jî bingiha „cih“ derketiyê û bûye mijara „dem“. Di vê mijarê de Mead jî pêşniyar dike ku em goçberiyê di konteksta „cih“ derxin û bikin konteksta „dem“ de, ji ber ku dema nû de, êdî cih wateya xwe wunda dike (Mead 1971: 94). Anko koçber di „dem“ên nû de ne, pirsgirêkên jihevnegirtina demê kevin yên ew têde (postfigurâtîf) û demê nû yên têde dijîn (prefigurâtîf), di mijara koçberiyê de sereke ne.

Wekî mirhov li binyadên malbata Kurd dinere, dibîne ku binyadên malbata Kurd û yên malbata devletên koçgirtî jî hev pir cuda ne. Wek mînak, di malbatên wan dewletan de malbat hatiye piçukkirin ku takekes bêhtir xweyî azadiyê bibe. Anko ev karakterên malbata Kurd jî yên wan cuda ne, pir zanyarên wan dewletan di wî fikrî de ne ku malbat dijî entegrasyona wan e. Lê belê wekî mirhov dinere, dibîne ku pergala civak û siyaseta Elman ferzendê nade ku ev malbat xwe pêşve bike. Di malbatê de ciwan hêvojkarîya otorîter wek kêşe nabînin. Lê belê ciwan ferzenda takekesî ya ku ev civakên modern didin wan, zanin û wekî di malbatê de kêşeyeke pir mezin derkeve, jî malê bazdidin, anko zanin ku wê werin parastin. Ne tenê di kategoriya kevneşopî de, di kîjan kategoriye de bê jî pirsgirêk ji aliye binyadên civakî yanî yên cudatiya jiyancîhanî derdikevin. Ev mijara jiyancîhanî xwe bi mijara çandî ve giredide û ji bona vê yekê pewîst e ku hewl were danîn, civaka Kurd bi mijara çanda jiyancîhanî ve were kategorîzekirin.

Wekî mirhov li dîroka koçberîya Kurd dinere, dibîne ku di koçberîya Kurd ya Ewropa de hejmara mirhovên kal-pir kêm e. Anko koçberên Kurd bi gelemerî dêûbavên xwe bi xwe re neanîne û di malê de mirhovên pîr tune ne, ev xal bandoreke pircure û xurt li takekes, malbat û civatê dike. Ev xal jî bona guftûgoyên li ser her çar cureyên newşan pir muhim e. Yanî sosyalizasyona newşan ji bandora mirhovên temenmezin bêpar maye. Di zanyarî de tê bawerkirin ku wekî bapîr û dapîr (dede ve nene) ne amade bin, mirhov karin zutir jiyaneke nû bistênin (bnr. Mead 1971: 74). Yanî wekî newşên nû bandora mirhovên temenmezin nestênin, ji bona wan avakirineke azad ya jiyancîhanî hesanîtir e. Di ser de, wekî Mead anî zimên, di vê rewşê de, mijara tekiliya xweyitîyê wunda dibe. Yanî têkiliyên malbatî lawaz dibin. Ev jî ji bona mijara kêşeya navnewşî muhim e û gava papîr û dapîr bi koçberan re koç nekin, têkiliyên wan kesên koçkirî bi kevneşopiyê re lawaz dibin.

7. Kategorîzekirina newşên Kurd

Berî ku mirhov qala kêşeya navnewşî bike, pêwîst e ku mirhov kategoriyeke ji bona cudatiya pêşketina civakê peyt bike ku newşên wê civakê jî ji hev werin cudakirin. Kategoriyeke wusa

¹⁴ Di gotinên Kurdî de meseleyek li ser vê rewşê tê gotin: Dibêjin ku anko Adem û Hawa bê dêûbav bûn, qedr û qiymetên dêûbavîti fehm nedikirin, lê anko zarokên wan hebûn, qedr û qiymetên zarokan fêrbûbûn. Ji bona vê yekê zarokên wan jî qiymetên dêûbavan nizanin.

¹⁵ Tenê yên nevwexş an jî bona sedemek wusa ne mecburin, herî avjeniyê. Bi rastî ev pirsgirêkek Misilmanên li Ewropa ye.

kare alîkarî bide ku mirhov karibe newşên Kurd di civaka Kurd de bicih bike. Gelnasa Emerîkî Margaret Mead (1971) mijara kêşeya navnewşî guftûgo dike û vê mijarê bi peyva çandê ve giredide. Mead di vî warî de sê kategoriyên civakan ji hev cuda dike. Di van kategoriyan de civak li gorî pêşketinên civakî û bandora li ser newşên wê cuda cuda dahûran dike. Mead di kategoriya yekemîn de çande wek *çanda postfiguratif* (*biçimsellik sonrası kültür*), ya didoyê wek *çanda kofiguratif* (*aynı biçimsellikteki kültür*), ya siseyê wek *çanda prefiguratif* (*biçimsellik öncesi kültür*) bi nav dike (Mead 1971: 27). Lê belê wekî li jêr jî werê xwiyakirin, tenê ev her sê kategori têrê nakin ku mirhov karibe newşên civaka Kurd bi bingiha çandê ve ji hev cuda bike. Wusa xwiya dike ku pêwîstiya kategoriyeke din di navbera postfiguratif û kofiguratif de heye û ev jî di vê xebatê de wek *çanda figuratif* (*biçimsellik kültürü*) hatiye binavkirin. Anko di dema Mead de guftûgoyên li ser modern-postmodern nebûn, Mead nikaribû wan têgînan bikar bîne. Lê belê wusa xwiya dike ku postfiguratif civaken kevneşopî, kofiguratif yê modern û prefiguratif yê postmodern in.

Ev her çar kategori karin alîkarî bidin ku mirhov di serî de çarçoveyekî ji bona newşên Kurd yê îro, derxê holê. Di vir de pêwîst e, di serî de werê gotin ku çarçove cudakirina newşan ne li gorî temen¹⁶, lê li gori teşeyên cuda yê civakî, çandî, aborî, ramyarî, takekesî yanî li gora jiyancihanî tê danîn. Hêjayê gotinê ye ku ne kategorîzekirina newşan ne li gora temen ne jî li gora teşeya jiyane ve ne hesanî ye. Lê belê ji bona ku guftûgoyên li vir tînin kirin, werin tîgîhiştin, pêwîst e, mijar werê kategorîzekirin. Ji bona vê yekê di vê gotarê de raman û kategoriyan Mead dê ji bona „kategorîzekirina newşên Kurd“ werin bikaranîn. Mirhov wan her çar cureyên kategoriyan di hevdemî de di nav civaka Kurd de dibîne û bi rastî sînoren çar newşan bi bingiha pêşketina civakî, ji hev cuda dike. Mead, ramana xwe û krîterên cudadiyên civakî li ser pêşketina teknîkî dideyne. Lê belê di vê gotarê de wê ne tenê mijara teknîkî, mijara aborî ya malbat û rola wê ya di civakê de, rola tevgera siyasî, sosyalîzasyon û hwd. jî wek pîvan ji bona cudakirina jiyana newşan werin bikaranîn. Mirhov karê wan pîvanan di konteksta Kurdan de hem bi pêşketina civakî hem jî bi pîleya fêrbuna newşan ya li ser jiyana modern bi kar bîne. Lê belê hejayê gotinê ye ku mirhov bejê, her kategori li gora takekesan hatiye danîn û ne li gora koma mirhovan. Yanî takekesên dikevin nav kategoriyeke de, bi tevahî komekî ava dikin û temenê wan kare zarok, ciwan, mêr, qertemêr an pîr be. Kategori ne li gorî giyan, lê li gorî çandê hatine danîn:

a) Newşa postfiguratif: Ev newş xweyî çanda kevneşopî ye. Ji bona vî newşî malbat li ser civakê re ye. Ol an eşîret wek pîvan sînore nasnamê dideynin. Mijara „em û yê din“ (biz ve digerleri) li gora sînore olî, eşîretî, bavik an heremî dideynin. Zarok li gorî dêûbavên xwe mezin dibin. Modela zarokan, dêûbav an kalên wan in. Sînoren nasnameyeke kesayetî he lawaz e û ramana neteweyî pir kême. Mirhov ne takekes e, tenê „kes“ekê endamê civakê ye, yanî anonîm e. Binyadên malbatî yê kevneşopî ne û eşîret û feodalî pir bi bandor in (bnr. Barth 2001; Izady 2001; van Bruinessen 2003; Leach 2001). Hem malbat hem jî civak di bin bandora patriarkalîzmê de ne û malbat, malbata mezin e û gelek caran malbata sê- an çar-newşî, yanî pirnewşî ye (bnr. Mead 1971: 31). Xwemalî an jî aîdiyeta bi civakê re bi gelemperî bi rîtuêlên çandî, wek sinet, zewac, tovbekirin û hwd. ve tê kirin û ne bi perwerdeyeke modern. Perwerdeya dibistanî pir kême û ya heyî bi gelemperî ya olî ye. Di jiyane de guhertin pir kême derdikevin holê û guhertin di nav newşê postfiguratif de wek felaket tê dîtin. Bi gelemperî di gundan de jiyana dikin, koçberiya bajaran nû dîstpekiriye. Alavên teknîkî pir kême in. Hilbiran bi gelemperî hilbirana cotemenî ye (bnr. Leach 2001). Cihê vî newşî di politikaya rêveberiya devletên tîde jiyana dikin, pir lawaz e. Maf û cihê jinê li

¹⁶ Wekî mirhov li civaka Kurd dinere, dibîne ku newşên Kurd li gora temenê wan wek zarok (bin 18'ê re), ciwan, (yên di nav 18-25), bixweyî (yên di nav 25-45), qertemêr (yên di nav 45-65) û kal (65-?) karin werin kategorîzekirin.

gora rêbaza kevneşopî ye. Saziyên bi navên Kurdî pir lawaz in. Kesên di rola serokan de, kesên kevneşopî ne. Ev kom bi gelemperî xweyî çanda devkî ye (bnr. Karatas 2017). Bîraniya/mejuyê wan bi gelemperî bîraniya/mejuyê kurt e¹⁷. Fêrbuna wan ya dîrokî jî herî bêhtir heta sê-çar bavikan paşve diçe¹⁸. Wek Mead (1971: 36)peyt dike, paşeroj û pêşeroj di nav vê çandê de heman in. Di nav mirhovên xweyî çanda postfiguratif de pirsên wek; „*Ez kî me? Çi jiyana min wek endamê civakê pêk tênê? Ezê çilo bi axivim, çilo tevger bikim, çilo xwarinê bixwim, çilo razim û çilo bi evîn bibim, çilo mesrefên jiyana xwe bi dest bikim, ezê çilo bibim bav (an jî dayik), ez çilo mirinê fehm dikim?*“ her demî beyî mirhov werê dinê, hatine pejirandin“ (Mead 1971: 32, derbdan di orjînalde ye). Ev pirs ji bona mirhovên di postfiguratif de ne muhîm in. Ji bona wan mirhovan rastiyek tenê heye û zubizu naye guhertin. Çand û nasname xwe-bi-xwe (kendiliğinden) hene (Mead 1971: 51 û 55) û mirhov pir şuphe nakin. Rexne di nav vî newşî de fenomenek biyanî ye. Ehlekê emîrî di nav postfiguratif de raser e. Hêjayê gotine ye ku hijmara endamên vî newşê di civata Kurd ya li Elmanyayê de pir kêr in.

b) Newşa figuratif: Mead, wek hatî gotin, newşek û çandê wusa neaniye zimên, lê belê di konteksta Kurdan de çandeyek ku ne tam kevneşopî ne jî tam modern heye. Ev kategorî li vir ji aliyê me ve wek newşa figuratif hatiye pênaskirin. Bêguman newşa figuratif di civata Kurd de hem bi hejmarî hem jî bi hezî cihekî mezin digre. Ev newş bi aliyê teknîkî jî newşê postfiguratif cuda ye, lê belê pir bin bandora çanda postfiguratif de ye. Alavên rojanê bi tevahî modern in, lê nîrxên wan yê kevneşopî ne. Xwe û malbata xwe dijî bandora modernê diparezin. Ne karin jiyanê modern bişopînin, ne jî karin wek newşa postfiguratif bijîn. Herdu çand harmonîze kirine. Malbat pir muhîm e, lê xwe ji mijara eşîretê hinekî dur xistine. Bi bandora siyasî mezin bûne, lê nikarin mijara siyasî ya Kurdan bi ya cîhana sîvîl ve girebidin. Hewl didin ku zarokên wan di bin bandora wan de bimênin. Lê belê zarokên wan li malê û di nav civakê de du jiyane dijîn. Li malê wek çanda dêûbav û di civakê de wek jiyana azad tewger dikin. Bi gelemperî di jiyana wan de, herî hindik carekî koçberî heye. Televîzyonê pir bi kar tênin, lê nikarin internet an jî medyaya civakî zêde bi kar bênin. Ramana nasnameyê ke kolektîf heye, lê sînorên vî nasnameyê ne gelekî zelal in. Ferehbûna sînorên azadiyê heta sînorên malbatî ne. Di sînorên malbatî de azadiya takekesî bi dawî tê. Piştrayên (yeni nesil) vî çandê bi gelemperî dikevin nav çanda kofiguratif de. Zarokên di malê de xwendibin jî, di bin bandora malbatê de ne. Li cem mirhovên di vî kategoriyê de hurmet ji mezinan re pir muhîm e. Malê dinyayê ji vî newşê re pir muhîm e û qiymeteke mezin jî didin perwerde ye.

c) Newşa kofiguratif: Ev newş ev kes in, yê ku xwe ji newşê û çanda postfiguratif û figuratif dur kirine (Mead 1971: 62). Hejmara wan kasî an jî ji hejmara newşên figuratif hinekî kêmtir e. Ev kes bi gelemperî bi ramana çepî û di bajaran de mezin bûne. Zarokên wan kesan bi gelemperî xwendine û wek dêûbavên xwe ji jiyana nujen fehm dikin. Newşê kofiguratif şahidên demê xwe ne (Mead 1971: 61). Bandora dibistan, derdor, heval û kesayetiyên civakê yê wek nivîskar, hunermend û hwd. qasî ya malê ye. Vî newşê modela xwe bi xwe afirandiye (Mead 1971: 66) û ne wek ya postfiguratif û figuratif de modela bavûkalên xwe sitandine. Wekî newşên nû modelên xwe ji mirhovên dema xwe bigrin, tê wê wateyê ku xwe ji newşên kevin dur dixin (Mead 1971: 61). Di koma kofiguratif de hem newşê nû hem jî ye kevin peşketî ne û xweyî azadiyê ne. Lê belê ev newş sînor û naveroka sîvîl ya zarokên xwe dipêjirenin (Mead 1971: 61). Malbat xweyî binyada malbata dendik (çekirdek aile) e. Têkiliya

¹⁷ Ji bona mijara mejû bnr. Assmann (1992)

¹⁸ Ji bona peyv û konteksa „bavik“ bnr. van Bruinessen (2003), Yalcin-Heckmann 2002, Karatas (2002, 2004); Yildirim & Karatas (2014).

malbatê bi binyadên eşîretê re lawaz e an jî qed tune ye. Têkiliyên newşên nû bi bapîr û dapîrên xwe re, pir e. Rola dêûbav jî di tekiliyeke rûbarî de ye. Ev newş xweyî çanda nivîskî ne, mejuyê wan zedetir bi ser mejuyê dur ve ye. Ramana wan ya dîrokî bi gelemperî ji jêderkên nivîskî tê. Ev newş xweyî ramana Hestê Em-Komî (Biz-Grubu-Duygusu) ye û ji bona vê yeke xweyî nasnameyeke kollektîf in. Rola olî di mijara „em û yên din“ de lawaz e û bi gelemperî dijî serweriya olî ne. Dijî jiyana kevneşopî derdikevîn û bi gelemperî xweyî ramanê modernîst in, yanî çand û jiyana Rojavayê Cîhanê erenî dibînin.¹⁹ Vê komê ji bona axaftina zimanê sitandart berxwedaneke çandî daye. Ev kom her çiqasî polîtîze bûbe jî, gelemperî bi ramana devletên têde dijîn, li gelê Kurd dinerin. Îdeolojiya wan bi gelemperî ji Tevgera 68'an, ya çepî û sosyalîzmê tê. Dema vî newşî pêkan e ku kurt be (Mead 1971: 62). Mirhovên di nav vê komê de, ne karin xwe li ser paşerojê, ne jî li ser peşerojê konsantre bikin. Rewşa wan her demî rubarî ye (Mead 1971: 72f). Çiqas çandê rexneyî ru dabê jî, rexne ji bingeha filozofî bêpar e. Newşê kofîguratif ji bona jiyana xwe her demî dijî newşê postfîguratif de, di parastinê de ne.

d) Newşê prefiguratif: Ev newş, newşê herî nujen e û hewl dide xwe ji newşê kofîguratif û hemû newşên din cuda bike. Ew ji dêûbavê xwe bêhtir bi jiyana nujen ve giredayîne û di nav de dijîn. Dêûbavên vê newşê, hem mijara zimên, hem ya dîrokê û hem jî ya nasnamê ji zarokên xwe fêr dibin. Ev mirhov ji yê kevin bêhtir zane ne (Mead 1971: 111). Ev newş bi gelemperî bi ramana Kurdî li jiyana dinerin û xwendewan in, an xwendine. Ev newş di nav teknîkên pêşketî de hatine dinê û ev beşek ji jiyana wan e. Sînorê azadiyê yê wan ji newşên din pir ferehtir e. Hejmara vê newşê ji ya kofîguratif kêmtir e. Mijara Kurd û Kurdistanê ji bona wan pir muhîm e û ramana xwe di berdîr ser dîrok, nasname, çand û zimanê Kurdî, lê belê di wan mijaran de bi gelemperî mijarên ku jiyana kevneşopî refere dikin, red dikin. Ji bona vê yekê ji çanda Kurdî ya kevneşopî bêpar in. Bi ramanê hişk dijî orf û edetên kevneşopî derdikevin. Ramana malbatê li cem wan lawaz bûye. Bi gelemperî bi Kurdên ji heremên din yê Kurdistanê re di tîkiliyê de ne. Mijarên wek eşîretî, olî yên ku sînoran di naveroka Kurdan de di deynin, red dikin û dijî wan derdikevin. Nasnameya xwe navesêrin û bi nasnameya Kurd derdikevîn holê û polîtîzasyona wan pir xurt e. Ji bona prefiguratif pêwîst e ku mirhov ramana xwe ji bingehîn ve biguherene (Mead 1971: 131). Pevguhazî di jiyana wan de pir muhîm e û bi alavên pevguhazî ve bi cîhanê re tîkildar in.

Wek hatî gotin, îro ev kategoriyên ku li jor hatine danîn di heman demî de di civaka Kurd de xwiya ne û her yek ji wan newşekî cuda dide xwiyakirin. Di wan kategoriyan de temen ne xaleke sereke ye. Tiştê kategoriyê dipêjirene, bi gelemperî teşeya jiyana ye. Ne tîne di nav Kurdan de, di konteksta cîhanê de jî rewş heman e. Ev jî balkeşiyê dema îro ye ku çandên curê curê û ji hev pir cuda di hevdemî de ru didin û di nava raya giştî de xwe eşkere dikin. Pirsê herî muhîm ya ji bona kêşeya navnewşî ev e, gelo kîjan ji wan newşan di civaka Kurd de bêhtir bi bandor e? Newşa ku îro gona xwe dide civaka Kurd kîjan e û kîjan newş hewl dide xwe bi jiyana cîhanê ya modern ve entegre bike?

Li gora vê kategoriyê di mijara newşan de civata Kurd pirrengî ye. Fakorekî bandorê li vê rewşê dikin jî pircure ne. Mirhov kare wan faktorên wek *faktorên jiderveyî* û yên *navxweyî* ji hev cuda bike.

e) Faktorên ji derveyî: Ji aliyekî ve Kurd di nav civakên cuda de hatine parkirin û bin dandoreke mezin ya wan civakan de ne. Kurd li Îraq û Surî de di bin bandora Erebi, li Îran di bin bandora Farsî, li Tirkî di bin bandora Tirkî, li Ermenîstanê di bin bandora Ermenîyan de ne. Ev bandor rewşa nujên ya wan civakan ji bingehîn ve sînardar dike. Heremên Kurdan di hemu dewletên hatine bi nav kirin de, di warê aboriyê de yên herî paşda mayî ne. Ji bilî başur,

¹⁹ Di vî warî de li ser civaka Kurd bnr. Yalcin-Heckmann (2003).

Kurd ne xweyî mafê xwe ne ku xwe bi rêve bibin û bi serê xwe civakên xwe form bikin, zarok û ciwanên xwe perwerde bikin. Civakên Kurd ji aliyên biyaniyan ve tînen kontrolkirin, rêvebirin û perwerdekirin. Yanî çiqas zarokên Kurd di malbata Kurd de werin sosyalîzekirin jî, ji aliyên çand û zimanên din ve tînen akulturasyon kirin û bandora akulturasyonê hêdî hêdî – ji bona dibistan, pevguhazî, medya û hwd. – ji ya sosyalîzasyona malê xurttir û bibandortir dibe. Yanî di vir de rewşeke wusa derdikevê holê; wekî civaka Kurd ji aliyê hinek din werin formkirin, hingî newşên Kurd jî dikevin cihê newşên wan hêzan de û kêşeya wan jî ne bi civaka Kurd re çedibe, lê bi civakên mezin, yê wan dewletên tede jiyan dikin, re çedibe. Ev xal xalekê pir muhîm e û anko kêşeya newşên nû ne bi civaka wan re ye, guhertinên nujên jî ne di nav civaka Kurd de ru didin. Gelek faktorên din yê jî derveyî hene. Lê belê ev faktorên hatin gotin, yê bingehîn in.

f) Faktorên navxweyî: Ji aliyên din ve faktorên navxweyî hene ku bandorê li kêşeya navnewşî dikin. Civaka Kurd civakeke segmenter e. Di dîrokê de serokekî gelê Kurd, wek kiral, şah, padîşahê an papazekê wan çenebûye. Tu carî di nav pergala dewleta xwe de nehatine hêvojkirin. Di dîrokeke kevn de ziman û wejeyekê yekser ji hemu civakan re ru nedabû. Beşek civaka Kurd di nav eşîretan de atomizê bûbû, binyada beşeke mezin ya civaka Kurd û malbata Kurd pedersahî ye. Civak di nava koçber û goran de polîralîze bûbû. Pevguhazî bi gelemperî devkî bû, kevneşopî pir xurt bû. Di warê aborî de pir lawaz mane. Di ser de dewletan cudatiyeke sînorî kiriye nav gelê Kurd de. Ev cudatiyên hatine zimên, ne tenê bingeha sedema neyekîtiya gelê Kurd ava dikin²⁰, li ber vê rastiye çand û jiyancîhana Kurdan jî xurt bandor dike. Ev xalên hatine danîn di heman demê de bandoreke nerenî li nasnameyekî kollektîf ya Kurdan dikin.

8. Kêşeya Navnewşî Ya Di Nav Kurdên Diyasporayê De

Kesê carekî guhdarî dide sohbeke Kurdên diyasporayê, dibîne ku bi gelemperî di her malê de pirsgirêkên mezin di nava zarok û dêûbavên wan de hene.²¹ Gelek ciwan û keçan ji malê bazdane, gelekên dêûbavê xwe şikayet kirine ku zext li ser wan tînen kirin, jihevberdan ji bawerîya herkesî bêhtir e. Ciwanên marjînalîzebûyî, yê di nav haşîş, alkol de pir in û hwd. Wekî mirhov wan mînakên tene ber caxwên xwe, dibîne ku kêşeyeke mezin ya parental û filial de heye. Lê belê çima ev pir xwiya nake û di mijara civakî de kêşeyeke ber caxwê nade?

Di heman deme de wek mirhov li çarçoveya mezin ya civata Kurd dînerê; mirhov nabîne ku ciwanên Kurd çandeke xwe ava kirine, xweyî rawestiyeyeke filosofî ne, di nav dijberiyeyeke ehlaq û binyadiyên jiyana kevneşopî de ne. Li gora radestiyê zanyarî, wekî rewşa kofîguratif di nav hemantemeniyên de bi sazî bibe, hingî fenomena jêreçand (Subkultur) derdikevê holê. Gelo ciwanên Kurd jêreçandeyeke cuda ava kirine? Li gora cavdêran wusa xwiya dike ku sembolên ciwanan, nezîkbûna nasnameyî û konsuma wan ji yê kevin cuda dibe. Li cem newşên nû seksa ne zewacî, xwarina goştê berêz, vexwarina alkolê û hwd. dide xwiyakirin ku nîrxên olî bêhtir û zutir lawaz dibin û ev kêşeyê mezin nakin, lê wekî hiyerarşî di malê de bu xeter, kêşe bi lez mezin dibe. Li cem newşên nû eleqeya îdeolojîyê kêr dibe lê ramana neteweyî zêde dibe. Xaleke balkeş û bercaxwê di civata Kurd li Elmanya de ev e ku newşên prefiguratif gelek kirinên newşên postfiguratif wek „irrasyonel“ dibînin.

²⁰ Neyekîtiya Kurd pir tî zimên, lê belê bi gelemperî di vir de qala nêyekîtiyeke di nav partiyên Kurd de tînen zimên. Bi wateyek rast ev nêyekîtiya di nav binyada civakê de ji ya siyasî muhîmtir e û heta yekîtiya nav civakê de di warê hest, ziman û nasname de newe serêrastkirin, yekîtiya siyasî jî ru nade.

²¹ Civaka Kurd di mijara asimilasyonê de pir şiyar e. Mînakeke ji welatê Siwisre dide xwiya kirin, mijara asimilasyonê çilo fehîm dikin. Di axaftinê de takekesekî ji postfigurasyon got; „Carê ji me dixwestin ku em xwe entegre bikin. Me jî ji zarokên xwe re digot, „Kuro wusa bikin weke ew dixwazin, lê dibe ku ev ji me re bibe pirsgirêk“ yanî me digot em wan dixapênin. Niha em dibînin ku em ji ya ku wan dixwest bêhtir hatine guhertin, berî ku em pê bihesihin“.

Di diasporayê de ciwanên Kurd bi gelemperî di nav civatên çep de ne. Lê belê ciwanan sazî, komel an komên xwe ava nekirine. Ji xeynî yên siyasî pir hindik şahî, festîval, kom an çalakî afirandine. Di rojevê de qed behs li ser tevgerê ciwanên Kurd naye kirin. Yên heyîn jî, yên weke hinek komên motosikletan, gelemperî bi rewşa siyasî ve giredayi ne. Di mijara siyasî de pir radikâl in. Newşên 60î û yên 80yî yên cîhana rojava wek newşên protest tèn dîtîn (Fogt 1982: 2). Her çiqasî vê rewşê bandor li newşên Kurd yên wê demê kiribe jî, bingeha radikalîzebûna newşên Kurd ji vê mijarê cuda ye. Anko dewletên Kurd tede jiyân dikin, sînorên 'xwe-îfadekirin' a gelê Kurd teng dikin, ev jî dibe sedema radikalîzebûna Kurdan (bnr. Natali 2009).

Di vê mijarê de dîmenên herî bêhtir xwiya dikin, dimênên jina Kurd in. Wusa didin xwiyakirin ku emansipasyona jina Kurd gelekî ji civakê cuda bûye û ketiya cihê reveberiya civakê de. Lê belê ji xeynî mijara siyasî hebûna jina Kurd di rojev û medyaya mainstream ya dewletên rojava de pir xwiya nake. Hetta zîlamê Kurd di civaka mezin de bêhtir xwiya ye û guhertin li cem jin û mêr cuda ru didin. Anko mêr gelemperî malxwe ye, yanî xweyiyê malûmilk e, bêhtir bi mirhovên din re dide û distenê. Lê belê rewşa "zîlamtî" ya di konteksta Kurd de di qîzekî de ye. Wek li jor hatî gotin, pergaleke jiyaneke vekirî, bi gelek aliyan ve ji bona jiyana kevneşopî dibe sedema krîzê an kêşeyê. Çarçoveya çanda "malxwe" sitreseke mezin dide bav/zîlêm, anko malxwe di herdu pergalan de ji hev pir cuda ne û wekî mêr ji herdu pergalan yekî dipêjirene, kêşeyek civakî ru dide. Di serde, di pergala civakên koçgirtî de qanûnên ku jinan diparêzin, pir xurt in. Anko di qanûnan de wekhevîya jin û mêr pir saxlam hatiye danîn, ev jî dibe sedema kêşeya ku heta bi belavbûna malbatê diçe. Jin dizane ku wê werê parastin û gelek caran neheqiyê napêjirene an daxwaza wekhevîyê dike. Gava daxwazên wê bicih newin, dikare ji mal biçê. Anko civak parastina yekitiya malbate wek peywira mêr dibîne, di mijara hevberdanê de bav an zîlam ji jinê bêhtir firaşa civakî digire ser xwe. Ev mijar ji bona rol û cihê kevneşopî ya zîlêm krîzekî derdixe. Bi wan mijaran re rewşa newşên temenmezin di bin sitresa civaka vekirî, pîrsgirêkên temenî, travma, bornaut de ye. Lê ev mijar ji bona wan kesan hêjî mijarên biyanî ne, lê belê ji newşên nû re ne wusa ye. Gelek caran newşên temenmezin nikarin rewşên giyanî li cem newşên nû têbigihîşin. Ji bona ciwanan konseptê „di nav do kursiyan de“ (iki sandelye arasında) heye, lê belê ciwanan sitratejiyên xwe ava kirine û ji heqê wan herdu jiyancîhanî derdikevin. Mijara din ya di newşên kevin tede ev e, anko wan bi gelemperî zîlm, îşkence, tecavûz û hwd. dîtine, di bin bandora travmayê de ne, lê belê nikarin bi zanebûn li ser vê mijarê rawestin. Ev jî gelek caran ji têgihîştina rewşa ciwanan re dibe asteng. Ya din, vî newşên temenmezin zarokatiyeke wek zarokên xwe neburandine û gelek caran nikarin newşên ciwan wek temenê wan têbigihîşin.

Newşên kevin di serî de dixwazin û hewl didin, hiyerarşiya zayendi û ya zarok û dêûbavan ya di binyada civakî û malbatî de biparêzin. Mijara rêzgirtinê ya kevneşopî di vir de roleke girîng dilîze. Mînakeke nav civaka Kurd kare vê rewşê bide xwiya kirin: Gelek ciwan an jî dêûbav alkolê divexwin. Lê belê wekî bav an civan heman demî di mekanekî de bin, navexwin. Ev mînak wek mijara rêzegirtina kevneşopî xwiyadike ya ku mêr navê jina xwe li cem xweyiyê xwe nahilde an jî kur an keç li cem bavê xwe naraje zaroka xwe an jî zaroka xwe maç nake. Ev herdu kirin mijarên rêzgirtinê ne. Yanî nevexwarina alkoholê û ne rahiştina zarokê an jî ne hildana navê heman rêz in û ev rêz rêzên ehlaqê kevneşopî ne. Yanî binyadên civaka kevneşopî kirinên nû bi xwe ve girê dide û nahele ku wek kêşeyekî derkevê holê. Wekî bav dibîne ku kur an keç li cem alkolê navexwin, yanî rêzê jê re digrin, bav jî astengiyê naderxê û herdu têkiliyek wusa sembiyotîk bi hev re dibûrenin. Lê belê wekî dêûbav astengî derxistin an jî keş an kur rêz ji dêûbavê xwe re negirt, kêşe derdikeve. Gelek kirinên wusa hene, ku yên kirinên nû bi rêzên kevneşopî ve giredidin û rêya kêşeyê digirin.

Newşên temenmezin gelek caran xwe weke yekî "bêfeyde" dibinin û bi vê hestê ve dikevin qîzê. Yanî wekî cihê dêûbav di binyada kevneşopî de kete xeterê de, kêşeyek ji bona wan derdikeve. Yanî di warê pergala nîrxî de kêşe bi lez rû dide. Di nav wan nîrxan de, ya herî

xurt rû dide, pêşketina nasnameya zayendî ye. Ji bona vê yekê mirhov kare bi rehetî bêje ku kêşeyeke newşên temenmezin heye û ev gelek caran ji kêşeyên ciwanan girtir e. Ev jî balkeşiyeye koçberiyê ye.

Lê belê gelo çima kêşeyên wusa di nav civata Kurd ya diaspora de wek kêşeya navnewşî nakeve nav rojevê de? Gelo newş ji hev cuda nebûne an sedemek din heye? Çiqas bersiva vê pirsê mijareke girîftî jî be, wusa xwiya dike ku civak bi sitratiyên xwe yê binyadî re kêşeyê diveşere an jî rê li derketina kêşeyê digre. Sê faktor xwiya dikin ku kêşeyê diveşêrin, yek jê ya sosyalîzasyona newşan e, ya din ya sitratiyaya malbata patriarkal e û ya din jî ya firaşa derveyî ye. Nêvengên wan kêşeyan jî ev in; ya teşeya jiyânî, ya nasnameyî (modern û kevneşopî), ya cinsî ya sînorên azadiye. Di bingehîna vê mijarê de xala yekemîn di sosyalîzasyona malbatî de xwiya dike. Ji bona vê yekê pêwîst e, mijara sosyalîzasyonê di malbata Kurd de werê peytkirin. Sosyalîzasyon, dema zaroktî ya ku runiştina keseyatî û nasnameya wî ye. Bi gelemperî ji zaroktî heta runiştina keseyatî wek dema sosyalîzasyonê tê dîtin. Di dawiya vê demê de kes zane kî ye, ji kuderê te, kok û nasnameya wî çi ye, olê wî çi ye, keseke çave ye, ehlaqê wî çilo ye û hwd. Di dawiya vê pêvajoyê de êdî yek an Kurd, an Elman, an Ereb e û êdî guhertina vê nasnamê gelekî ne pêkan e (Schrader û yd. 1979). Bi çanda ku malbat dide, teşe, şekl û şemala kes dirunene. Pirsê kêşeya navnewşî jî di karakterê ve çanda di sosyalîzasyonê de tê dayin de ye. Anko di vî warî de lêkolîn tune ne, mirhov nikare bersiva vê pirsê bide, lê tiştê xwiya dike, her kategoriyên li jor hatine danîn, çandeyeke cuda dide zarokên xwe û di nav ve çandê de ji bona „çareserkerinê“ sitratiyeyekî cuda bikar tînin. Karakterê sosyalîzasyona civakên ku di nav wan de kêşeya navnewşî heye, yanî yê modern, ev e ku di malbatê de sosyalîzasyonê demokratîk û azad heye. Di ser de bandora dibistan û saziyên perwerdeyê ji bandora sosyalîzasyona malê bêhtir e. Di civakên modern an jî di nav çanda ko- û prefiguratif de sosyalîzasyona malbatî û perwerde hev digrin. Ev rewş di nav sosyalîzasyona gelek malbatên Kurd de xwiya nake. Sosyalîzasyona malê gelek caran dijî ya civakê û perwerdeyî ye. Yanî newşên nû di konteksta malbatê de mezin dibe û piştê nikare cihê jiyanê bi sere xwe ava bike, anko bi malbatê ve hatiye giredan.

Anko piştî demekî, newşên mezin bi yê ciwan re tîne giredan, nikarin zextên mezin li ser wan bikin û ev jî sedemeke ku pêşiya kêşeya navnewşî tê girtin. Ya din, dirav di destên newşên mezin de ne û ji bona vê yekê newşên nû hewl nadin, xwe ji wan cuda bikin. Xaleke din mezinbûna malbatê ye. Di vê malbata mezin de xwedî/xweyî pir in û ev jî firaşeke xurt li ser ciwanan dikin. Di pergala kapitalîst ya wan civakan de cihgirtina kesî ne hesanî ye û wekî mirhovek ji wan bingehên pêwîst yê civaka modern bêpar be, nikare cihê di civakê de bigre. Anko kêşeyên ku kes di civakê de bistêne, ji yê malbatê bêhtir in, ev dibe sedem ku ciwan di malê de dimenin û ev jî dibe sedema lawazkirina kêşeya navnewşî.

Di civakên xweyî kêşeya navnewşî de giredaneke din ya bi sosyalîzasyonê ve heye, ev jî çanda netewî ye. Çanda netewî bandorek girîng li mijara newş, sosyalîzasyon û konstelasyona bihevregiredayî ya gel dide. Ev xal ji bona mînaka Kurd guftûgoyeke balkeş derdixê holê. Anko bandorake pergala netewe di nav Kurdan de tune ye, mirhov nikare newşên Kurd wek yê gelê bi xweyî nasname û saziyên netewe binere. Lê belê newşa Kurd ya nujên di ramana netewe de êdî xweyî bandoreke siyasî ye. Ev newş berxwedaneke mezin didin û bandoreke mezin ji bona sînorên nasnameya Kurd (sînorên Kurd û ne Kurd) dideynin, lê belê mirhov nikare bêje ku heman bandor di warê civakî de tê kirin. Polîtîka Kurd ji bona demokratîzekirina civaka Kurd rolekî mezin dilîhîze, lê belê ev çanda demokrasiyê di nav civakê de narune, anko firaşa civakî (sosyal baskî) ne di warê civakî de, lê di warê siyasî de tê kirin.

Encam

Wekî mirhov wan kategoriyan, yê bi alîkariya Mead hatine danîn, ji bona analîza newşên Kurd li diaspora bikar tîne, xalên li jêr hatine danîn, derdikevin holê:

1-Mirhov kare her çar kategoriyan di heman mala Kurd de bibîne. 2-Xwiya dike ku rewşa newşa postfiguratif pir teqez e. 3-Kêşeya navnewşî di nav malbatên ku hem temenmezin hem zarok di rewşa postfiguratif an figuratif de ne, kêr e an tune ye. Wekî herdu newş heman kategoriye de bin kêşe lawaz e. 4-Bi gelemperî di nav malbatên ku endamên wê ji post- û prefiguratif pêk tên, kêşeya navnewşî mezin e û bi şiddet e û gelek caran ne di warekî konstruktîf de dibûre. Bi gelemperî herdu newş ji hev cuda dibin (qutbûn) û têkilî pir lawaz dibe. 5-Bi heman şeklî kêşeya newşên kofiguratif û prefiguratif jî gelek caran xurt e, lê gelemperî qutbûn naderkevê holê û çêker (yapıcı) e. 6-Malbatên ku her sê cure di nav de heyî, guhertin bêhtir bi ramanê normal tê dîtîn û bi gelemperî çêker e, lê pir hedîka ye. 7-Newşa prefiguratif he sînor, gon û naveroka xwe bi tamamî diyar nekiriye. 8-Li gora aqlê zanistî, bi gelemperî pevajo ji postfiguratif bi ser aliyê prefiguratif de diçe. Ji bona vê yekê pêwîst e mirhov angaş bike ku civaka Kurd jî bi ser rewşa prefiguratif ve diçe.

Ji bona pirsê 'gelo li cem Kurdan formasyona newşan çilo bi rê ve diçe?' mirhov nikare hesanî bibersivêne. Pêwîst e lêkolînên zanyarî werin kirin, guhertinên civakî, ramyarî werin peytkirin û dîtînên newşan li ser jiyana û ji bona pêşerojê werin peyt kirin. Tenê wusa, mirhov kare newşên Kurdî pênas bike, ji hev cuda bike, avakirin û cudakirina wan peyt bike. Bi gelemperî mirhov kare bêje ku newşên Kurdan jî yê wek 60an, 70yan, 80yan, 90an hene. Wan newşan reaksiyonên cuda di mijara kevneşopî, bandora globalîzm, belavbûna kapîtalîzm û ya medyayê de dane û didin. Di nav newşên Kurd de, cudatiyek di mijara bikaranîna hîlbirandinên teknîkî de heye. Cudatiyek di warê ramana dîrokî û di ware nasname de heye. Lê belê civak he bi têritî di nav çînan de ji hev cuda nebûye. Çîna bilind ne runiştîye. Çîna navîn û ya karker xwe di nav Kurdan de ava nekiriye. Ji bona vê yekê mirhov kare, bersiva pirsê di serî de hatî kirin wusa bide: kêşeya navnewşî di nav Kurdan de heye, lê anko civak ji bingehîn nehatiye guhertin, cudabûna newşan ne derketiye holê û civak bi stratejiyên xwe kêşeyê diveşere. Kêşeya navnewşî lawaz e, anko cudabûna newşan ne radîkal e. Kêşeya newşên Kurd ne ji çînan civakî tê, lê ji şiyarbûna nasnameya komî tê. Ji bona vê yekê ramyarî ye. Newşên tebatî pir bi hez in. Faktorên derveyî yê bandorê li civaka Kurd dikin xurttir in. Hejayê gotinê ye ku mirhov bêne zimên ku kêşe naye wê wateyê ku her demî nerenî ye. Li gora Leggewie kêşeya navnewşî aliyê erênî heye. Kêşe sîgnalekî dide ku guhertinek pêwîst e û dive ev guhertin werê cih. Kêşe kare entegrasyonê bicih bêne û hêzekî ji bona modernîzmê biafirîne (bnr. Biber et.al 2010: 12). Lê pêwîst e guhertin û asîmîlekirin ji hev werin cudakirin

Ji aliyê din ve, bi encama guhertina civakî re kêşe bi gelemperî encameke qrîzekî, wek ya baweriyê ye. Hejayê gotinê ye ku qrîza bawerî ne tenê di wateya olî de, lê qrîza baweriyê polîtîk, ya malbatî, ya sazî, ya dewletê û hwd. jî tenê zimên.

Her newş temenê xwe bi xwe heye û ji bona vê yekê hem beşeke wê ya teorîk, hem jî yeke pratîk heye. Ji bona lêkolîna kêşeya navnewşî pêwîst e, mijarên kevneşopî, otorîte, peşketin, rihê demê û modê bikevin nav lêkolînê de (bnr. Kehrer 1959). Bergirtina kêşeya navnewşî guhertina civaka Kurd lawaz dike. Her çikas rê lê werê girtin jî, anko êdî kêşeyê ciwanên Kurd ya siyasî, civakî, ramyarî, olî, nasnameyî, zayendî û malbatî hedî hedî ru dide, pêwîst e, ji vir û pêde ev mijar ji her alîvê werê lêkolîn- û guftûgokirin.

Wek hatî gotin, Kurd bi sînorên hişk yê di nava civaka xwe ya kevneşopî de, ev 60 sal in di nav tevgerê ramyarî de ne. Vê tevgerê civaka Kurd bi hejmarek mezin polîtîze kiriye. Rewşenbîrên Kurd di wê hêviyê de ne ku li ser bingeha ramyarî gelê Kurd jî bona yekîtiyê û nasnameyê kollektîf şiyar bibe û civak pêşde biçê. Lê belê dîroka sîvîlîzasyonê û zanistiya civaknasî dide xwiyakirin ku ji bona peşketina civakî pêwîst e, di serî de aboriyê geş, hîlbirandîneke pîşesazî derve ku çînan civakî ji hev cuda bibin û çîna karker, ya navîn û ya bilind derkevê holê. Li ser perwerdeyê sitandart tevahiyê gel werê perwerdekirin ku civak xwe û cihanê behtir nasbike û cihê xwe di cihanê de bigre. Bi vî alî jiyancîhanî yê nû ru didin, kevneşopî radibe, sînorên di nav civakê de yê wek koçer-goran, serhetî-germiyanî,

rolên jin-mer yên pederşahî, binyadên trîbalî (eşîretî) û hwd. ji holê dirabin. Ramanên cuda dikevin nav civakê de û bi vê re civak demokratîze dibe. Newşên nu aktorên vê pevajojê ne. Lê belê di nav Kurdistan de ne mijara hilbirandinê kapîtalîst, lê mijara siyasî peywira ve pevajojê daye ser milê xwe. Ji bona vê yekê xala polîtîzasyonê di mijara kêşeya navnewşî de, xaleke herî muhîm e. Di vir de kare were angaşt kirin ku mijara siyasî di konteksta Kurdistan de ne tenê siyasî ye, heman demî civakî, aborî, nasnameyî, jiyancîhanî û zêdetirê vê ye.

Di nav van paradîgmayan de cihê newşên ciwan cihekî girîng e û pêşketina civakî – di pevajojêke normal de – roleke ciwana ye, lê belê anko newşên polîtîzebûyî li pêşiya civakê ne, ji dêvla newşên ciwan, newşê polîtîk dikeve pêş û cihê ciwanan digre. Yanî di warê guhertina civakî de peywira ciwanan, polîtîka tîne cih. Ji bona vê yekê kêşeya newşan jî xwe bi kêşeya siyasî ve giredide û êdî nabe kêşeyêke civaka Kurd, dibe kêşeyek ciwanên Kurd ya siyasî û berê xwe dide dewletên Kurd qut kirine.

Jêderk

Ahren, Yizhak (1984): Generationenkonflikte und die Entwicklung von Gemeinschaftsexperimente. In: Die

Lebensalter in einer neuen Kultur. Zum Verhältnis von Jugend, Erwerbsleben und Alter. Leonhard, Rudolf Walter (Hrsg.) Hans Martin Schleyer-Stiftung. –Köln: Bachem. S. 202-207.

Akpınar, Alişan & Bozkurt, Serhat (2011): Osmanlı Kürdistanı, Kürdistan Osmanî. Istanbul, BGST Yay.

Altan, Tan (2014): Kürt Sorunu. Timas Yay. Istanbul.

Assmann, Jan (1992): Das kulturelle Gedächtnis. Schrift, Erinnerung und politische Identität in frühen Hochkulturen. Beck, München. [Assman, Jan (2001): Kulturel Bellek. Eski Yüksek Kültürlerde Yazı, Hatırlama ve Politik Kimlik. Cev: Ayşe Tekin. Ayrıntı yay. Istanbul.]

Barth, Friedrich (2001) Kürdistan´da Toplumsal Örgütlenmenin İlkeleri. Avesta Yay. Istanbul.
Behrendt, Günter (1993): Nationalismus in Kurdistan. Schriften des deutschen Orient-Institut. Hamburg.

Besikci, Ismail (1994): Was ist Kurdenfrage. In: Heidi Hinz-Karadeniz & Rainer Stoodt (Hrsg.). Kurdistan: politische Perspektive in einem geteilten Land. Giessen: Focus, S.

Biber, Christoph, Drechsel, Benjamin, Lang, Anne-Katrin (Hg.) (2010): Kultur im Konflikt. Claus Leggewie revisited. Transcript Verlag, Bielefeld.

Brandt, Hartwin, Schuh, Maximilian, Siewert, Ulrike (hrsg.) (2008): Familie – Generation – Institution. University of Bamberg Press, Bamberg.

Brocher, Tobias (1973): Aufstand gegen die Tradition. Über den Konflikt zwischen Generationen. 2. Verlag.

Kreuz Verlag Stuttgart – Berlin.

Engels, Wolfram (1984): Neue ökonomische Aspekte des Generationenverhältnisses? In: Die Lebensalter in

einer neuen Kultur. Zum Verhältnis von Jugend, Erwerbsleben und Alter. Leonhard, Rudolf Walter (Hrsg.) Hans Martin Schleyer-Stiftung. –Köln: Bachem. S.3649.

Fogt, Helmut (1982): Politische Generation. Westdeutscher Verlag, Opladen

Franz, Erhard (1968): Kurden und Kurdentum. Zeitgeschichte eines Volkes und seiner Nationalbewegungen. Deutsches Orient-Institut, Hamburg.

- Heinrich, Lothar (1989): Die kurdische Nationalbewegung in der Türkei. Deutsches Orient-Institut, Hamburg.
- Izady, Mehrdad R. (2011): Kürtler, Bir El Kitabı. Doz Yay. Istanbul. İngilizceden Çeviren Cemal Atilla.
- Jureit, Ulrike (2008): Generation und Moderne. Kritische Anmerkungen zu einer begrifflichen Inanspruchnahme. In: Hartwin Brandt, Maximilian Schuh, Ulrike Siewert (Hrsg.). Familie – Generation – Institution. University of Bamberg Press, Bamberg. S.31-47.
- Jwaideh, Wadie (2012): Kürt Milliyetçiliğinin Tarihi: Kökenleri ve Gelisimi. İletişim Yay. 7. Baskı, İstanbul.
- Karatas, Avdo (2002): Dogu'da Xuni Gelenegi: Bir Gelenegin Yeniden Üretilmesi. Folklor/Edebiyat. 2002/4 Cilt. VIII Sayı XXXII. S. 69-76
- Karatas, Avdo (2004): Göç Üzerine Bir çalışma, Bîrnebûn, BIHARA 2004
- Kehrer, Prof. Dr. Ferd. Adalbert (1959): Der Wandel der Generationen. Eine bioplogisch-soziologische Studie- Ferdinand Enke Verlag. Stuttgart
- Kraft, Andreas & Weißhaupt, Mark (Hg.) (2009): Generationen: Erfahrung – Erzählung – Identität. UVK Verlagsgesellschaft mbH, Konstanz.
- Leach, Edmund R. (2001): Rewanduz Kürtleri. Ram Yay. İstanbul.
- Lehr, Ursula (1984): Auf dem Weg zur Fünf-Generationen-Gesellschaft. In: Die Lebensalter in einer neuen Kultur. Zum Verhältnis von Jugend, Erwerbsleben und Alter. Leonhard, Rudolf Walter (Hrsg.) Hans Martin Schleyer-Stiftung. –Köln: Bachem. S. 21-35.
- Leonhard, Rudolf Walter (Hrsg.) (1984): Die Lebensalter in einer neuen Kultur. Zum Verhältnis von Jugend, Erwerbsleben und Alter. Hans Martin Schleyer-Stiftung. –Köln: Bachem.
- Mayring, Philipp (1990): Qualitative Inhaltsanalyse. Grundlagen und Techniken. Weinheim: Deutscher Studienverlag 1990.
- Mayring, Philipp (1990a): Einführung in die qualitative Sozialforschung. Eine Anleitung zu qualitativem Denken. München: Psychologie Verlags Union.
- Mead, Margaret, (1971): Der Konflikt der Generationen. Jugend ohne Vorbild. Walter-Verlag AO Olten.
- Mendel, Gérard (1972): Generationskrise. Eine soziopsychologische Studie. Suhrkamp Verlag, Frankfurt a.M.
- Natali, Denise (2009): Kürtler ve Devlet. Irak, Türkiye ve İran'da Ulusal Kimliğin Gelisimi. Avesta Yay. İstanbul.
- Nagengast, Ulrike, Schuh, Maximilian (2008): Natur vs. Kultur? Zu den Konzepten der Generationenforschung. In: Hartwin Brandt, Maximilian Schuh, Ulrike Siewert (Hrsg.). Familie – Generation – Institution. University of Bamberg Press, Bamberg. S. 11-29.
- Özdemir, A. Kadir (2006): Die Kurden - ein Volk in drei Nationen: die Geschichte und Entwicklung des Kurdenkonflikts. Tectum Verlag, Marburg.
- Reifenrath, Bruno H. (1984): Generationenkonflikt als Wertkonflikt – Eine praexeologische Betrachtung -. In: Die Lebensalter in einer neuen Kultur. Zum Verhältnis von Jugend, Erwerbsleben und Alter. Leonhard, Rudolf Walter (Hrsg.) Hans Martin Schleyer-Stiftung. –Köln: Bachem. S. 168-177.

- Stiksrud, Hans Arne (1984): Gibt es einen Generationen-Dissens? – Zur Nahtstelle zwischen Jugend- und Erwachsenenenerationen. In: Die Lebensalter in einer neuen Kultur. Zum Verhältnis von Jugend, Erwerbsleben und Alter. Leonhard, Rudolf Walter (Hrsg.) Hans Martin Schleyer-Stiftung. –Köln: Bachem. S.192-201.
- Schmidt, Susanne (2000): Kurdisch-Sein, mit deutschem Pass! Formale Integration, kulturelle Identität und lebensweltliche Bezüge von Jugendliche kurdischer Herkunft in Nordrhein-Westfallen.
- Schmidt, Susanne (1998): Kurdisch-Sein und nicht -Sein. Einblicke in Selbstbilder von Jugendlichen kurdischer Herkunft von Susanne Schmidt, herausgegeben von NAVEND - Zentrum für Kurdische Studien e.V. Bonn, 1998.
- Schrader, Achim; Nikles, W. Bruno; Griese, M. Harmut. (1979): Die Zweite Generation Sozialisation und Akkulturation ausländischer Kinder in der Bundesrepublik. 2. Aufl. Königstein/Ts.: Athenäum Verlag.
- Strohmeier, M. & Yalcin-Heckmann, Lale (2003): Die Kurden. Verlag C.H. Beck, 2., durchgesehene Auflage, Nördlingen.
- van Bruinessen, Martin (2003) Aga, Seyh ve Devlet. Iletisim Yay. Ceviren: Banû Yalkut, Istanbul.
- White, Paul J. (2012): İkel İsyancılar mı? Devrimci Modernleşirmeciler mi? Weşanxaneyê Vateyî, Istanbul.
- Yalcin-Heckmann, Lale (2002): Kürtlerde Asiret ve Akralalik İlliskileri, İletisim Yay. Istanbul
- Yildiz, Hasan (2005): Fransız Belgeleriyle Sevr-Lozan-Musul Üçgeninde Kürdistan. Doz Yay. 4. Baski, Istanbul.
- Yildirim, Ayse & Karatas, Avdo (2014): Rûya Kardesligi. Folklor/Edebiyat, cilt 20, sayi 77, 2014/11